

**P**îşî geşbûna tevgera azadîxwaza kurd, hêzên dagirker giranî dan ser şerê psîkolojîk û xwestin bi polîtîkayên şîdetê îradeya gel teslîm bigirin. Îro şîdetperwer gihîştîye radeya gornebaşiyê.

Nîjadperest li aliyekî êrîşê cendekên gerîlayan dikin, li aliyê din ciwanên welatparêz dikujin. Polîtîkayên şîdetperest di derûniya gelê tirk de birînên xedar vekirine.

Psîkolog Kaan Arslanoğlu jî balê dikişîne ser vê rastiyê û dibêje hêzên serdest kesên ku aştiyê dixwazin wekî xayîn bi nav dikin.

Arslanoğlu dixwaze ku kurd û tirk li hemberî împeryalîzm û kapîtalîzmê destê xwe bidin hev bi vî awayî dikarin şerxwezanan bi tenê bihêlin. Şerxwazan bi tenê bihêlin.

Rûpel-3



## Divê em şerxwazan marjînal bikin

Hevpeyvîn:

Muzîk nikare civakê serobin bike, lê dikare rengîntir bike

R. 8-9

Wêje:

Qêrîneke xwedayî,  
Cubran Xelîl Cubran


R. 10

Vîranîn Zülküf Kışanak:

Weşîna şoreşê newî de  
Zeki Dağlıkan

R. 6

## Azadiya WELAT



SAMI TAN

Ev hêza faşîst, bi salan e ku xwîna welatparêz û şoreşgeran dirijîne. Piştî ku tevgera azadîxwaz a kurd geş bû. Îcar berê gurgebozan kete Kurdistanê.

## Gurgeboz birînan xedartir dikin

Her tim kurd dibêjin şovenîzm hûteke mirovur e. Heke rê li ber mezinbûna wê neyê girtin, ew ê xesareke mezin bigihîne gelan. Çend bûyerên ku heftaya çûyî qewimîn, vê dîtîne diçespinin ango îsbat dikin.

Pêşî roja 1'ê Gulanê xortekî ku ji polîsan direvî, bi xeletî kete avahiya MHP'ê. Li wê derê, bi awayekî hovane faşîstan êrîşî wî kirin, xwestin wî di pacê re bavêjin. Piştê li Boluyê xwendekarê welatparêz Kenan Mak, ji aliyê birek faşîst ve, digel hevalekî xwe hate kêrkirin. Mak şehîd ket. Li pey wê jî, xortê welatparêz Bilal Vural li Kağthanevê dîsa ji hêla çend faşîstan ve hate kuştin.

Berî vê jî gelek navçeyên HADEP'ê leqayî êrîşên komikên faşîst hatibûn, ew bi destê wan hatibû şewitandin.

Ev hêz, bi salan e ku xwîna welatparêz û şoreşgeran dirijîne. Berî 12'yê rezberê tevkujiyên girseyî yên mîna

Tevkujiya Meraş û Çorumê bi destê wan pêk hatin. Piştî ku Tevera Azadîxwaz a Kurd geş bû. Îcar berê gurgebozan kete Kurdistanê. Çi di bin timtêlên leşkerî de, çî jî wekî timên taybet xwîna mirovên sivil rijandin. Hin caran şaşîk û cube wergirtin, ketin eyarê Hizbullahê, lê di rastiya xwe de her wekî gel jî digot, ew "Şeytanok" an jî "Hizbikontra" bûn.

Wan gurgebozan dixwest, li Kurdistanê ji xwe re bingehêkê ava bikin, lê gelê kurd ew ji nêzik ve nas dikirin, lewre jî ji bilî çend çaş û xwe-firoşan kesî guh neda wan.

Lê li Tirkîyeyê, wan di nav kesên nezan û ciwanên tolaz de ji xwe re bingeh dît. Ji ber ku şerê kirêt, di derûniya civaka tirk de birînan xedar vedike, gelek kes bi wan tînan xapandin. Dagirker jehra şovenîzmê wekî merhemê rayî gelê nezan dide. Ango gelê nezan dixwaze birînan xwe bi vê jehrê bikewîne, lê ew jehr birînan kurtir dixe.

Lewre şovenîzm piştîgiriya ji bo şerê kirêt zêdetir dike. Ew jî dibe sedema birînan nû. Heke mirov bi awayekî din bibêje, her ku şer dirêj dibe zêdetir mirov tene kuştin, nexweşiya derûnî ya civaka tirk xedartir dibe.

Di rastiya xwe de gelê tirk jî wan gurgebozan ji nêzik ve dinase. Bi hezaran mirovên demokrat û şoreşger bi destê wan hatine kuştin. Berî cuntayê gelê tirk li hemberî wan baş li ber xwe da. Lê çî hefî ku pêşengiyê zanistî û jidil li holê nîn bû. Lewre jî berxwedêr bi komikên faşîst hate bi sinorkirin ango hêzên li pişt wan nehatin dîtin. Lewre jî li hemberî cuntayê tu berxwedan pêk nehat.

Lê îro bi geşbûna Tevera Azadîxwaz, tîkiliyên dewletê û çeteyên faşîst diyartir bûne. Bi tenê maye ku, ew perdeya şovenîzmê ji ber çavê gelê hilanîn. Ji bo vê yekê jî tiştê pêwîst avakirina bereyê hevgerî yê gelan e.

## Bihar raperîna jiyanê ye

M. ZEKÎ ETİZ

## Ferhengok

**ajdan:** êz dan (fili-zenme)  
**asayî:** normal  
**aram:** hêmin, bi huzur  
**avû:** ava bi pey sûtina kêrê  
**awarêbûn:** ji rê veqetîn  
**awêne:** neynik, mirêk, hêlî  
**azwer:** ihtiras  
**balinde:** teyr  
**berik:** gule, qurşun  
**bêçir:** cimexweş, bêxuy  
**bisîn:** besimîn, (gûlümsemek)  
**cezek:** term, meyît  
**ceste:** beden, laş  
**çespendin:** peyî-tandin, teyîdkirin  
**çelîkirin:** dabaşkirin, beşkirin  
**çira:** lembe  
**derûn:** rih  
**deyax:** berxwedêr  
**dilbîjîn:** dil lê çûyin  
**firende:** teyr  
**germîjîn:** sarûgermbûn  
**gewşîn:** taybetmendî- (özellik)

**gêrik:** morî, gêre  
**gêrkirin:** xêlikirin (yikmak)  
**handan:** tewşîqkirin  
**hefîn:** pir-westiyan  
**îndewar bûn:** zindebûn (canlandirmek)  
**kavil:** pag, kôlxane  
**karigerî:** bandor, tesîr  
**kelijandin:** kaynaşturma  
**kewandin:** tedawîkirin  
**kunêr:** çiban  
**kohne:** çavbal, qurnaz  
**rawestgeh:** durak  
**rêbaz:** metod  
**spide:** alacakaranlık  
**sirûd:** marş  
**şanzî:** sêrbilindî, onûr  
**şewaz:** ûslûp, terz  
**telîqîn:** zayina kûçikan  
**timtêl:** cil û berg  
**raberkirin:** pêşkêşkirin  
**raydan:** nişan dan  
**raperîn:** serhildan  
**perşan:** nesîr  
**peyk:** uydu  
**qelûn:** sigarâ ağızlığı  
**xunav:** çiseleme

Bihar; demsala herî xweş, xwedî bereket û bextewarî ye.

Bi hatina biharê re singa axê vedibe, mîna Çemê Munzûrê, ava spî dipişike û bi der dibe. Rûbar û çem, bi xuşîn û bi xume-xum hêdî hêdî pêla di-de xwe ku bi çoşeke mezin biherikin. Bêhna gul, giha û kulîkên cur bi cur ji her deverê mîna bêhna mîsk û embarê difûre.

Çiqas ji bo welat û xwezayê girîngiya biharê heye, çî û rista şoreşê jî ji bo civakê wisa ye. Ji ber ku şoreş, mêtîngerî û zordariya dagirkeran ku mîna sir û seqema zivistanê mirovahiyê hişk dike, ji holê radike, çerxa civakê bi aliyê jiyanêke bi rûmet û azad ve dizivirîne. Berî her tiştî şoreş, civak û şexsiyetê ji binî ve diguherîne. Lewre heya şexsiyeta ku dijmin daye dariştin neyê hilweşandin, ne gengaz e di rihê me de bihara azadiyê aj bide. Bi kurtasî şoreş, mirovên nû û nûjen diafirîne. Bi afirandinê re çand, exlaq û terbiyeyê hemdemî derdixe holê. Ev gewşîn, azwer (ihtiras) û ramana mirovan ji hemû qirêjîyan paqij dike. Cîhanek zelal û bêmetîngerî mîna biharê ku ji her derî bêhna mirovatiyê û kulîkên azadiyê jê difûre, tê lidarxistin. Ji bo çî şoreş û bihar mîna hev in? Sedema vê yekê, di biharê de zemheriya zivistanê li ser xwezayê radibe, hemû cureyên gul û

kulîkan bi awayekî şad serê xwe bilind dikin. Têkoşîna Rizgariyê jî wiha gemara koledarî û bindestiyê ji ser gelê kurd radike, gelê kurd ji xewa mirî-nê şiyar dike, mîna kulîkên biharê serê xwe li hember xwînmîjan bilind dike

Di Welatê Rojê de pir biharên xweşik û watedar hebûn. Lê mixabin gelê kurd tu carî ev bihar bi dilekî geş nedîtibû û bi şahî nejiyabû. Lewre ev bi-

Serokê Neteweyî wiha dide xuyakirin: "Divê em pêşî di nava xwe de bihara hêviyê pêk bînin." Ji bo ku em biharên herî bi rûmet bijîn, divê em agirê şerê neteweyî li her deverê gur bikin. Ev bes bi rêxistineke xurt gengaz e.

har ketibûn bin bandora zivistanê dagirkeran. Ev erdnîgariya ku mirovatî tê de pişkivîbû, tev hate şewitandin û wêrankirin, ji layê neyaran ve. Tiştê herî xeter nak jî, ew bû ku, kesayetiya gelê kurd jî hatibû berevajî kirin.

Şoreşa serxwebûnê, di demek wiha dijwar de dest bi têkoşîn û vejandina bihara mirovahiyê kir. Tevera Azadiyê, bi têkoşîna xwe re kesayetiya kurdan ya kevneperest jî hedimand. Ew rihê qirêj û xayin hate ji rastê hate rakirin. Tevera Azadiyê, bi ked û xebata xwe çavkaniya ku neyar jê hêz di-

girt da zuwakirin. Kaniya jiyanê herikand. Ev kaniya ku bi xwîna leheng û şervanên azadiyê hate vekirin, di giyan û ramana gelê kurd de tovên biharê reşand.

Yanî mêtî, fikir, hest, moral, hêvî û baweriyek tekûz ji gelê kurd û mirovahiyê re hate peydekirin. Çiqas gewşî-nên mirovatiyê yên zelal hene, hemû di bîrdoza partiyê de hatin diyarkirin. Gelê me jî xwe li ser vê bingeha tekûz, dest bi xebata xwe û mirovahiyê kir. Vê xebatê jî dilê kurdan dewlemend û zana kir. Ji bo gelê Medya biharek nû, jiyanek nû, şadiyek nû da avakirin û bi nîrxên Welatê Rojê ve da kelijandin. Ku bi awayekî din bê gotin, gelê kurd ber bihareke rengîn de dimeşe û di meşla xwe de biratî, wekhevî, serbilindî û çoşeke mezin dide hemû mirovahiyê.

Ger me bivê, em jiyanek azad û serbixwe bijîn, pêwîst e em xwe ji şexsiyeta gemar û koletiyê paqij bikin. Em kesayetiya xwe li ser bîrdoz û siyaseta Partiyê ava bikin. Bi giyana biharê bixemilînin. Wekî ku Serokê Neteweyî dide xuyakirin: "Divê em pêşî di nava xwe de bihara hêviyê pêk bînin." Ji bo ku em biharên herî bi rûmet bijîn, divê em agirê şerê neteweyî li her deverê gur bikin. Ev bes bi baweriyêke mezin, bi rêxistineke xurt û bi niştimanperweriyêke bilind gengaz e. "Nexwê em biharên mezin nabînin û nikarin bidin jiyanêkî"

# Divê em şerxwazan marjînal bikin

Artesa tirk, dixwaze gelê tirk ji aliye psikolojik ve teslim bigire. Lê gelê tirk li gorî zanyarên psikologan di pêvajoyeke zor xesas re derbas dibê. Hin bûyerên ku diqewimin, nîşanê din ku hestên şovenîst serî li hemû nîrxên insanî girtine. Gel ji aliye şûrkêşên şer ve tê tahrîkkirin. Cendekên leşkeran dibin sedema pêl dana hestên şoven. Li aliye din êrîşên li ser cendekên gerîla, ku bi salan e ji aliye leşkeran ve dihat kirin, êdî bi handana faşîstan, bi destê kesên ji rêzê jî pêk tên. Mînakê dawîn bûyerê li Antalya ye. Armanç jî, di vî pêvajoya marjînalîkirina tevgera kurd de, meşûrkirina çalakîyên kesên şovenîst û mîlîtarîst e. Digel hemû xebatên şovenîst jî, gelê tirk hê di nava gelek nakokîyan de ye. Ev rewş xebata aşî û biratiyê hê watedar dike.

Li ser vî yekê em bi psikolog û romanîvîs Kaan Arslanoğlu re axivîn. Arslanoğlu niha, li Nexweşxaneya Dewletê ya Kartala Stenbolê de, kar dike. Wî, rewşa dawîn a psikolojiya gelê tirk ji gelek alîyan ve nîrxand.

## Şidetê rehên xwe berdane nav civakê

Psikolog Arslanoğlu, pêşîn li ser politikaya şidetê rawestîya û daxuyand ku, di van demên dawîn de bandora şidetê xurtir bûye. Wî got: "Ji zarokatiya me hetanî vî gavê, politikaya şidetê li Tirkiyeyê serdest e, lewre politikayên şidetê li vî welaflî pere kirine. Ji ber vî yekê jî ev politîka roj bi roj bi pêş dikevin. Wekî encamê dewletê politikayên bi şidetê ve girêdayî çiqasî derxe pêş, wê ew şideta dewletê û şideta kesên ku li dijî dewletê ne, tevî hev bibê û digel vî yekê rewşê aloz derdikeve holê." Li gorî Arslanoğlu, hemû şidet ne bêheq in, lê di van 14-15 salên dawîn de tiştên ku li Tirkiyeyê tên jiyandin, piştgiyariya bo şidetê ye.

Arslanoğlu di axaftina xwe de balê dikişîne ser şideta psikolojik û dibêje: "Ji ber çî şideta psikolojik? Diyar e ku, civaka me, bi vî kirina xwe hin pêwîstiyên xwe yê psikolojik pêk tîne. Çima politikayên bi şidetê ve girêdayî bi ser dikevin, çima politikayên din bi ser nakevin? Divê mirov bipirse. Civaka me ji civakên din zêdetir handariya şidetê dikê."

Kaan Arslanoğlu vî rewşê civakê tirk, bi perwerdehiya nava malbatê ve girêde û dibêje: "Lewre jî politikayên ku hêzên mîlîtarîst dimeşînin, dibin serdest." Arslanoğlu di berdewamî axaftina xwe de, dide zanîn ku şidetperwerî di nav goşt û hestiyê gelê tirk de bi cih bûye.

Dîsa li gorî daxuyaniya wî, ew hest ketiyê nav saziyên wan jî. Bi dîtina Kaan Arslanoğlu, ji bo ku şidet di politikayê de serdest be, divê siyasatmedar nerm xuya

"Divê gel rasterast aşiyê biparêze. Gelek kesên alîgirê aşiyê hene. Lê belê bi awayekî taktîkî aşiyê diparêzin. Ne dijminê kurdan tirk in, ne jî yê tirkan kurd in. Bi awayekî giştî sistemeke kapîtalîst û împeryalîst heye. Eger ew her du gel li dijî vî têbikoşin, wê aşî hê hêsantir pêk bê."

nake, divê hişk be. Arslanoğlu psikolojiya kesên ku piştewaniya şidetê dikin jî wiha rave dike: "Komên ku şidetê diparêzin dibêjin, 'An tu yê ji aliye me bi an jî tu yê lêdanê bixwî.'"


Psikolog Arslanoğlu balê dikişîne ser operasyonan û wiha dibêje: "Di van salên dawîn de, heta di mehên dawîn de em dibînin ku, hin kes dibêjin binêrin em çawa şer dikin, gelek şehîdên me çêdibin, naxwe hûn ne ji me ne. Hûn xayîn in. Hûn welat difiroşin. Bi vî awayî gelê terorîze dikin. Jixwe karakterê çapemenî û medyayê diyar e." Arslanoğlu dadixuyîne ku, dema gel ji wan kesan gefên bi vî rengî dixwe, dikeve nakokiyê û mecbûr dimîne ku, ew ji du alîyan piştgiyariya aliyekî bike.

## Ligel her tiştî divê gel aşiyê bixwaze

Her wiha Arslanoğlu diyar kir ku, gelê tirk di bin bandora dîn de maye û lewre jî nêrîna qedêrperestiyê pê re heye. Li aliye din li gorî gotina Arslanoğlu, tirk hin tiştan nikarin biguherînin, jixwe bi wan re ew hêza guherandinê jî nîn e. Serdestiya ol jî ji wê tê.

Her wiha psikolog û romanîvîs Kaan Arslanoğlu li ser jî vî politikaya şidetê bandorgirtina gelê kurd jî rawestîya û di daxuyaniya xwe de diyar kir ku, gelê kurd berê çawa bandor girtîbe, wê îro jî heman tesîrê li ser bike. Li gorî wî, gelê kurd û gelê tirk her du jî dibin zordariya politikayên ku ji şidetê pêk tên de ne.

Arslanoğlu li ser pêşerojê tu texmînan nake, dibêje ku wê di demeke kin de, ew hêzên ku şidetê diparêzin, wê xurtir bibin. Arslanoğlu li ser aşînexwaziya gelê tirk jî dîtîna û ramanên xwe vedibêje. Ew diyar dike ku, esas di nav gelê tirk de, kesên ku aşiyê dixwazin hene, yê ku dixwazin bi riya 'lihevîkirinê' meseleyê çareser bikin jî, hene. Lê belê dema hûn şidetê wekî gavake sereke bi kar bînin, wê ew kesên aşîxwaz jî li paş bimînin. Li gorî Arslanoğlu, ew kesên ku çêlî wê kêşeyê dikin, dikevin rewşa xayînan, bi çavekî ne baş li wan tê nihêrtin.



Psikolog-nivîskar Kaan Arslanoğlu

Arslanoğlu vî rewşê wiha şîrove dike: "Ev yek di xwezaya şer de heye. Di dema şer û pevçûnan de, hûn nikarin tiştên bi mantiqî bibêjin. Di cih de hûnê xayîn bînkirin."

Li hemberî van politikayan jî bo her du gelan çî pêwîst e? Di vî warî de jî romanîvîs û psikolog Kaan Arslanoğlu, alternatîftekê pêşniyaz dike û dibêje: "Divê gel rasterast aşiyê biparêze. Di navbera parastina aşiyê û parastina taktîkî de gelek cudahi hene. Gelek kesên alîgirê aşiyê hene. Lê belê bi awayekî taktîkî aşiyê diparêzin. Roj bi roj ber bi we ve diçe. Lê belê eger jidil aşî bê xwestin, wê bandora wê bêhtir be."

Arslanoğlu pêşniyazêke din jî raber dike û dibêje: "Ne dijminê kurdan tirk in, ne jî yê tirkan kurd in. Bi awayekî giştî sistemeke kapîtalîst û împeryalîst heye. Eger ew her du gel li dijî vî têbikoşin, wê aşî hê hêsantir pêk bê."

Bi baweriya nivîskarê tirk, eger şerê çêbibe jî, divê li gorî rastîyan çêbibe. Vî yekê jî insan naxwazin. Lê dîsa jî dema ku aşî bê xwestin divê ne taktîkî be. Bi awayekî jidil be, divê em wan hêzên ku şer dixwazin bi tenê bihêlin.

AZAD ALTUN

## Kurtenûçe

Roja 6'ê gulanê li NÇM ya Stenbolê, ji bo protestokirina serdegirtina NÇM ê û binçavkirina 21 xebatkar 4 mêvanê wê, civîneke çapemeniyê hate li darxistin. Di daxuyaniya ku Serokê Enstîtuya Kurdî Hasan Kaya, Cigirê rayedarê IHD yê û rêvebirê NÇM ê Yusuf Çetin, Berpirsê Weşanxaneya Aram û Sorunê V. Haydar Güleç û Sırrı Öztürk û Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan beşdar bûn de, hate gotin ku dagirkirin li gorî îtirafên Şemo û bi talimatên MGK'ê pêk hatiyê.

Wezîrê Karê Derve yê Qibrîsê Yannakis Kassulidis daxuyand ku, ew PKK'ê wekî rêxistineke terorîst nabînin û bi çavekî baş li têkoşîna rizgariya gelê kurd dinihêrin. Kassulidis, di civîna komîteya mafên mirovan a meclîsa nûneran de, der heqê nezîktêdayîna hikûmeta Rûm a li hemberî kurdan pîrs bersivandin. Kassulidis wiha got: "Em PKK'ê wekî rêxistineke terorîst nabînin. Ji bo îthameke wisa divê biryareke dadgehê hebe. Lê heta îro biryareke ku PKK'ê terorîst nîşan dide, nehatiye girtin."

Cigirê Wezîrê Karê Derve yê Yewnanîstanê Yorgo Papandreu li Strasburgê bi pîrsên derbarê vekirina buroya PKK ê li Atînayê re rû bi rû ma. Papandreu diyar kir ku, nezîktêdayîna wan li hemberî PKK'ê ji nezîktêdayîna dewletên Ewropayê ne cûdatir e. Her wiha wî got ku, rêxistinên bi vî rengî heta ku li welatên wan piştî ku derneketin derveyî zagonan ne xem e. Yorgo Papandreu, bi birxist ku li herêmên kurdan pîrsgirêka mafên mirovan û demokrasîyê heye.

Hate ragihandin ku, di navbera 15-25'ê adarê de Pêncemîn Konferansa PKK'ê ya Rojhilat Navîn hatiye li darxistin. Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, fermandarên ARGK'ê, rêvebirên ERNK ê, nûnerên YCK û YAJK'ê jî di nav de, 250 delege beşdarî konferansê bûne. Her wiha ji çar hêlên Kurdistanê rewşenbîr û hunermend jî beşdarî vî konferansê bûne. Konferansa ku rûdanên li Tirkiyê û Kurdistan û Rojhilata Navîn hatine nîrxandin de, axaftina vekirîna jî hêla Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ve hatiye kirin.

# Vizêr zîndanî bî, ewro dora ma ya

**G**ama ke kes vindeno û vîno, demdo raverde ra; kamjîn welat beno wa o welat bo, senî ke şarê qandê estîna xo sere hewa dayo, zordestan jî ê şarî sero xetê konevaniyê liminî (qrejî) dayê ramitin. A didin jî hepsî û zîndanî viraşt û verniye nê sereberzkerdena tepîştê, ya qetil kerdê, yan jî miyanê sereyê ci kerdo veng û îşkencan û pirodayina "terbiyê" dayo ci ver.

Ewro na raştay ma hewna jî rind vînenê ke, Serehewerdena şarandê rûmetan çend stûr (xurt) biya, heps û zîndanê zorkaran jî, zor û zehmetî biyê.

Serhewadayina û lejê xoser biyayena şardê mayê jî hezera ser o ke binê dandê zorkeran ra nêvejiyayo. Zîndanê Amedî cayendo zaf gird geno. Gama ke kes vîno dîroka hespandê şarandê bînan ra; qetlîam, kiştênî, îşkence, pirodayin; heme çi esto, jew çi çiniyo. Merdimî merdimê ra veten, karêdo zehmet kerdo bi namedê ciya kerdo. Ek ereb o namedê erebî ya, ek yahûdî yo namedê yahûdî ya ci rê zulm kerdo. Verî nimayê ci qebûl kerdo, dima jî ci rê zahmet kerdo.

## Serhewadayinê newe zey ê verîn niyo

Na xeylê girîng a, ê ke welatê ci talan biyo şarê ma û ê ke nameyê ci jî qebûl nêbeno û namedê xerîbiya, zorina tirk kerdena zor û zehmet vînenê fina ma yê. Naya jî nê vindenê "Namedê kurd û Kurdistanî ya, merdim û merdimêya çi-çi esto, gerek o ke şima bivirejê." No konevanî merdimî merdimê ra veteno. Hele ke welate ma Kurdistan de tesîre nê konevanî qat qat beno vêşî û barê merdimay heveya jî beno giran. Çirê ke welatê ma de hetanî ewro 28 serhewadayinî saz biyê û veşiyê ci jî dewleta tirkî dest ra amêye fetisnayin. No sedeb ra şardê ma sero tesîrendo gird verdayo û baweriya şardê ma pê re nêmend bî. Wexto ke ma na raştay bizanê, ma do bizanê ke zebeniyanê Hepsê Amedî çira şoreşgeranê Hepsê Amedî, sero hend kay kerdê.

Serhewadayinê PKK, duşmenî jî, rind zanayê ke zey serhewadayinanê verînan niyo. Bi qehremanî û fedakariya girda, demando zaf kilm de şarê Kurdistanî sero baweriyêdo bêhesab verda. Şarê ma jî çend na fedakarey dî hend jî xo pa girêda. Hewt sereyî ra hetanî hewtay sereyî amey xo ser û na bûyer silasnê.

Duşmenî senî ke no rewş dî, va: "Ek ma verniyanê nînan teslîm nêgîrê, ma do nêşe fia baweriyek şarî sero verdaya bişikînê." Na jûwerî ra kewtî ray û kotî de merdim mend o, kurd esto û boya merdimayî ci ra yena, ruhê welatparêzey tey esto, heme arêdey pê ser û kerdî qefesê Amedî.

Kotek, îşkenceyo heme hawayan,



qandê merdim bişo xo jiyan bikero, çiçi gerek o heme çi kerd silah-û hemberê nê şoreşgeran, welatparêzanê ke xo verda girweynay. Heme çi sedemê îşkence û pirodayinî bî. Hiwaten, bermî qisey kerden xo liwayen zarûrî îxtîyacê xo diyin, hevermok (volta). Armanca a wa ke hepsiyanê, şoreşgeran teslîm bigiro, înan sero kay bikero, şarê ma het de, rûmetê înan nêverdo. Duşmenê barbarî rind zanayên ke; heme hetiya raya da newî, ziwanêdo newe û girêdayena newiya viraziyena. Na virazyayina newî zey serhewadana verînan niya, mergê duşmenî jî xoya piya ana. Heme hetê jîyanî tarî kerdena duşmenî jî nay ra bî.

Tevera jî hal zewbî nêbi. 12 rezbere peyra şarê a sero, konevaniyê ke amey ramitin heme hetiya şarê ma girotibi çemberê xo. Yanê ê ke sereyê xo hewadayê ya qetil kerdê, yan jî îşkencexaneyan ra ravêrnayê. Ebi kilmeya erd û ezman şarê ma sero kerdbi teng.

## Ebi xoverdayin lecî jî beno gird

Na nixta de, cayê Hepsê Amedî û xoverdayin û serhewadayinê kek Mazlûm û embazanê bînan vijeno werte. Tarîxê partiya ma û werte vijiyayinê lejê ma yê merdimê de cayêdo zaf girîng geno. Dîroka şaran de jî yeno çiman ver ke, xoverdayena zîndanê çend xurt biya, lejo ke vera zordestan jî ameyo dayin hend biyo xurt û saxlem.

Kes ke a tespît bizano û gerekê ci çiçiyo, biyaro herûn, eyrê baweriya xurt, zeriya gird, lazim a. Na raştay herûn arden jî eke heme çi de xoya xo bidê xebata xo, ancax îyê biyarê herûn. Raştay ser winî jî vijiya. Duşmenî welatê ma de, ma rê cejnem viraşt bi. No cejnem ra raya cinetî akerden karê her kesî nêbi.

Gorey Mazlûmî bi no kar. Embaz Mazlûm, Xeyrî, Kemal û embazê ma yê binî komê pê biy û şew piya fikiray: "Ma se kerê"? Bersiva persî eşkera bî. "Partî ma rê xoverdeyin, îmkân çiçi beno wa o bo, bersiv biyayen misnayo."

## Pêlpêloga xoverdayinî embaz Mazlûm

Na girêdayina embaz Mazlûmî sera 1982 de şewa 21 adar, verê roja Newrozî hîrê kîbrîtî veşnay, kerdî meşalayê roşniya raya cenetî û xo jî kerd pêlpêloga (pil pilik) xoverdayinî. Verê raya şarê ma bi şewq û teniya hepsan de, nêmend, çeher leteyê Kurdistanî de bi roşnî. Mîraso ke ê merdimê girdî verda: "Xoverdayin jiyan a". Ferhatî, Necmî, Eşrefî û Mahmudî kerd find û raya merdimê de, gandê xo sero adir wekerd û kerd roşnî.

Gurzo ke Kawayê Hemdem, kek Mazlûmî hewar da, çehar histaran (histertk) kerd berz, Xeyrî, Kemal, Akîf û Elî qeraro gird a, 14 fîrmeh de da seredê toximê Dehaqan ro û ala serhewadayin û ala şehîdan resnê ezmanan. Wezîfeyo ke kek Mazlûmî ard herûn. Embazanê ma yê bînan, Ferhat û hîrê embazan heştêsê menga gûlan de xo veşna, Xeyrî, Kemal, Akîf û Elî jî kewtî rojeyê mergî. 14 fîrmeh bi roj û redê Kurdistanî sero akewt, tariyeya hezar serana qelîsnê.

Na xoverdayen sero wina vano: "Gerêkêna jûwerî esto ke kes vajo dîroka dewleta tirkî de kewtina tewr gird, hemberê xoverdayena PKK de, û xoverdayena, zîndanê de girota wahşetî bindi, tever dê îxanetiya ray nêverde bî. Mazlûm, Kemal, Xeyrî û Ferhatî, înan 1982 de, xoverdayenakê resnê (serkeftin) sere. Xoverdayena PKK, şexsiyeta PKK îşkence û wahşetî kolanlîstan vistî."

## Adirê ganê çiharan bi roşnî

Namey Mazlûmî welatê Kurdistanî de merdimê û şexsiyeta de zelzele viraşt. Xoverdayena, Xeyrî, Kemal, Akîf û Elî bi hewn û kewtî zeriya lajan û keynanê kurd, bi gird koya Cûdî û Agirî sero gerîlay. Adirê ganê Ferhat, Necmî, Eşref û Mahmudî bi roşnayî kewtî çimanê kal û pîranê ma, bî fedakarey winî ke, hetanî ewro şarê ma qe ne bibi şahîd. Na al, hetanî ewro bi sayedê nê qehremanan û êkê raya înan mûqades de şî û rêzê înan ramît, bî berz, hetanî ke na raya mûqades bêro ramiten, aya her roj jî berz bo.

Eger ewro hezarana gerîlayê ma, konyanê Kurdistanî de bi heybetina sera key (mala) merdimê viraşt, hezarana xebatkarê partî û milyonan welatparêzî de rih biyo aya ameyo sazkerden. Xoverdayena xo, îmkananê xo ya şenê heme şaran rê bibê mînak û merdimêya heme cihanî pey bihesnê, eger gerîlayê ma ewro Kurdistan de, serdi şino û Tirkîya jî girota xo ver, no hendeya hez û quwetî bindê îlmê serokatî yo, êke xo nê îlmîya rojda verîn ra girêdayê û şarê ma sero konevaniyê wahşetî viraziyeyê ganê xo kerd werte û nê konevanî vindar-nayê, cefayê şehîdanê girdan de rakewno.

Ewro no îmkano ke kewto ma dest, hezarana serî yo kalîkanê ma dest nêkewto. Ma qîmetê ney bizanê û çilkên awê bo jî ma de kerê nêmirî (hevîr) miyano do rew alêwî yo. Eke çilka namûsî menda, wezîfe no yo.

\*Eno niwîs jew girotxane raya mektûba nişyawa ma rê, nameyê wayirê niwîsî nênişyawa.

# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 10 -

## Cinavkên nêtar

Her wekî çawa li ser binavkirina cînavkan hinekî alozî û tevlihevî heye, di warê ji hev veqetandina wan û navandina birên cînavkan de jî nakokî û alozî hene. Bo nimûne heta niha navên ku li cînavkan hatine kirin ên ku em pê dizanin ev in: Pronav, bernav, cînav û cînavk. Belkî birek navên din jî hebin ku em pê nizanin.

Her wiha di senifandina cînavkan de jî dubendiyek balê dikişîne. Bo nimûne Reşîdê Kurd navê "Bernavên bêhêl" daye cînavkên "xwe, /-ê/, cînavkên lihevxiştî û berbihevîn". Lê Celadet Bedirxan û Murat Ciwan ew di nava cînavkên kesane de hesibandine. Ravekirina Celadet Bedirxan û Murat Ciwan bi me rastir hat, lewre jî emê jî wan cînavkan di nava cînavkên kesane de hildin dest. Ev cînavkên ku emê di vê waneyê de çêlî wan bikin cînavkên xwe, /-ê/ ne. Dê cînavkên berbihevîn, cînavkên lihevxiştî û cînavkên pêrebestî jî bibin mijara waneyên di ayendeyê de.

"Cînavkên pêrebestî" jî aliyê Celadet Bedirxan ve wekî "lêkera bûn" hatine destnîşankirin, lê di rastiya xwe de ew jî cînavk in û cûdatiya wan jî yê

din ev e ku ev cûre cînavk bi dawiya lêkeran ve dibin.

## Cînavka xwe

Ev cînavk di nava hevokê de bi tenê cihê bireseran digire, bi tu awayî cihê kirdeyan nagire. Ango ew cînavk cihê navdêrên tewandî digire, cihê navdêrên xwerû nagire. Cînavkê xwe jî aliyê zayendê ve nêtar e, hem cihê navdêrên mêm hem jî yê nêtar digire. Her wiha jî aliyê mêmêrê ve jî ew cînavkeke bêhêl e. Yanê ew cînavk hem cihê navdêrên yekjimar hem jî cihê navdêrên pirjimar digire.

## Peywira cînavka xwe

Pêwîst e ku mirov hinekî jî li ser peywira vê cînavkê raweste. Di hevokê de heke, kirde û bireser heman kes be, di cihê bireserê de cînavkê "xwe" tê bikaranîn. Heke mirov bi awayekî din bibêje, di hevokê de sê kes hene, yek kesê axîfbêj, kesê guhdar û kesê ku li ser tê axaftin. Yanê ez ji te re qala wî/wê dikim, yan jî em ji we re qala wan dikim. Heke kesê ku bipeyive û kesê ku pê re tê peyivîn heman kes be, hingî xwe cihê kesê duyemîn digire.

Gava karê ku yek dike li wî/wê ve-

gere xwe tê bikaranîn. Dema yek li awênêyê dinihêre, dibêje: "Ez xwe dibînim" nikare bibêje; "Ez min dibînim." Dîsa mirov nikare bibêje, "wî ew dît" lewre heke wisa bê gotin, dê tevlihevî çêbibe, dê hinek bibêjin ka wî yekî/e din dîtîye, lewre jî divê bibêje, "wî xwe dît."

## Çewt bikaranîna xwe

Ji bo ku rista wê cînavkê bastir bê famkirin, divê hinekî li ser xeletiyê ku li herêmine Kurdistanê tê kirin, rawestin. Di kurmanciya derdora Semsûr, Meletî, Ruha û Elbistanê de mirov dibîne ku cînavkê "xwe" di cihê cînavkên wî/wê de jî tê bikaranîn. Wekî minak li wan herêman yek dikare bibêje; "Navê xwe çi ye?". Xuya ye ku ew bikaranîn ne di cihê xwe de ye. Dema mirov pîrsa kî arasteyî lêkerê bike, bersiv dê vê çewtiyê bide dest. Gava em bipirsin; "Navê kê çi ye?" dê bersiv wî/wê be. Me divê di stranê gelêrî ya ji herêma Semsûrê ve çewtiyê nîşan bidin.

Lo lo berxê bar e  
Miyê berx e, bizinê kar e  
Karî ku tu dikî ne tu kar e  
Pêşî şîrî e, paşîya xwe tal e.

Di vê minakê de jî xeletî diyar e. Li vir xwe cihê kar digire, kar bi kirde re ne heman kes e, lewre jî divê di cihê "xwe" de "wî" bihata bikaranîn.

## Çend minak li ser bikaranîna cînavkê xwe

Min serê xwe şuşt

Wî li rewşa xwe nihêrî û rastiya xwe bi bîr xist.

Zinê navê bavê xwe ji me veşart.

Bozên riya gundê xwe nîşanî me da.

Reşo çû mala xwe, ji bo me çend heb nan ji diya xwe standin

## Cînavkê /-ê/

Ev cînavk cihê kesên sêyemîn ên yekjimar wî/wê digire. Taybetiya vê cînavkê ev e ku wekî qertaf bi dawiya lêkeran ve dibe û cihê kesên sêyemîn ê yekjimar digire. Ev cînavk jî aliyê zayendê ve nêtar e. Li şûna ku yek bibêje, *min gote wî/wê*, dibêje *min gotê*. Ev cînavk jî bi tenê cihê navdêrên tewandî digire. Dema yek bipirse, bibêje, "Gelo tu çûyî Amedê?", wekî bersiv mirov dikare bibêje, "Ez çûmê." Mirov dikare bi çend minakan dawî li mijarê bîne:

Li cihê min daye wî/wê, min dayê

Li cihê ez dibêjimê wî, ez dibêjimê

Li şûna min şande wir, min şandê

Li cihê ez difiroşime wî/wê, ez difiroşimê

Di dewsa ez difirime wî welatî de, ez difirimê tê gotin.

## Seyda Cegerxwîn

HELÎM YÛSIV



**B**i derçûna sêzdeh salan, di ser koçkirina Seydayê Cegerxwîn re, li Qamişlo, li mala Seyda û li ser gora wî, bi navê nivîskarên kurd li Sûriyê ev gotar hate xwendin. Di 22.10.1997'an de.

Seydayê Hêja!

Em îro dîsa hatine cem te.

Hatina me ne hatina ser miriyan e. Em mêvanê mirovekî zindî ne. Eger jiyana derewîn, piştî xwe daye te jî lê tu carî te piştî xwe nedaye û tu nadî jiyane. Erê, Cegerxwîn zindî ye û dibe yê mirî em bin. Dibe ku jî mirî îro hatibin cem zindiyên. Berî çend rojan, ew çend kesên ku hatibûn li te û li M. Emîn Zekî digeriyan, ji bo we biçav bikin ne şaş bûn. Ji ber ku tu ew zanin ku hûn sax in. Hûn zindî ne. Hûn dilê gel in û dema mirovek dikeve dilê her mîrovî, tu hêz, tevî hêza mirinê, nema dikare wî ji holê rake. Vêca hetanî mirovekî kurd hebe hûn ê hebin. Ew tîrêjen ku te di

tariya şeva ziman û toreya kurdî de afirandin, roj bi roj, ronahiya wan zêdetir û geştir dibe. Gelek riyên girî te bi destê xwe vekirin. Heta vê gavê em bi wê evîna te ya mezîna û giran dorpeçkirin. Em îro hatine, ku li ber bejna te ya bilind û lihevhatî, bi rûmeteke giran, rawestin. Nema kaniyên helbest û hêrsa te dimiçiqin. Lê xeyd jî li ser rûyê te diyar e. Ev bêdengiya te ya niha xeyd e. Sedemên xeyda te jî nayên hejmartin.

- Reşayîya ku welat daye ber dagirkirinê, êdî ji temen dirêjtir bû. Temen çû û reşayî ma.

- Nevî, zarok û xelkê te helbestan naxwînin. Gel lal kirine, bêziman kirine. Gel piştî xwe daye ziman û toreya xwe. Piştî daye hebûna xwe. Dibe ku hinek bibêjin mecbûrî ye, zor e, lê em jî bi te re dibêjin, tu zor li dinyayê nika zimanê miletekî zindî, binerd bike. Belê eger mirov bixwaze, di binê şikeftan de be jî dîsa dikare bixwîne.

Lê.... Lalbûn berdewam e.

- Hevî û daxwaz, omîd û armanc, wekî firendeyên biyanî, cih û war ji xwe re nedîtine. Hêviyek tenê jî bi cih nehatiye. Lê ji bo razîkirina gîyanê Cegerxwîn çi pêwîst e? Em ê pîrsa xwe bêbersiv bihêlin. Hêviya me ew e ku, em tev de li bersivê xwedî derkevin. Cegerxwîn ne tenê helbestvanekî kurd bû,

ew bi xwe cîhaneke sax bû. Dîrok û neynika seranserê Welêt bû. Pêwendiyên di navbera nivîskar û jiyana wî de balkêş in. Helbest neynika jiyana wî ya têr-xebat û jiyana wî kaniya helbestan bû wî bi hostayî riya dilên xelkên xwe naskir. Derbas bû dilê her kesî, êşa her kesî kişand. Bûbû zimanê herkesî û mîna her mirovekî mezîna dişewitî, da ronahiyê bide. Ji ber vê di hiş û dilê me de, wê zindî bimîne. û bi rûmet û rêzgirtineke giran. Em wî bi bîr tînin. Li ser riya wî, bi awayekî hemdemî, bi hemû hêz û derfetên xwe, pêwîst e, nivîskarên kurd bersiva demê bidin.

Lewre pêdiviya ku em li rastiye xwedî derkevin tê holê. Cegerxwîn bi xwe ew rastî ye. Mirov jî, nemaze yê nivîskar çiqasî jî rastiye nêzik bibe û lê xwedî derkeve ew qasî dikare bibe zimanê gelê xwe. Neynika dema xwe û rengê agirê hinavê xwe.

Seydayê Hêja!

Em îro dîsa hatine cem te.

Da em hinekî xeyda te sivik bikin û bi hezkirineke mezîna destên xwe deynin ser dilên xwe û bi hev re ji bo şînbûna gîhayê rastiye biryar bidin, da ku di bin keviran de nemîne. Ji bo bidestxistina jiyaneke bi rûmet:

Em li ser riya te ne.

# Weşîna şoreşê newî de Zeki Dağlıkan

**O** Sêwreg ra bi, la belê Tersûs de bibi gird. Malbata ey, peyniyê seranê hewtayî de Sêwreg ra koç kerdibi. Ma Tersûs de taxa Mithat Paşa de embiryanê pê û malbatên ma embiryanî ra vêşêrî zey merdimanê pê bi. Hewna jî pê sero şinê û yenê, qeçekên ma û inan pê miyan de benê gird. Cok ra ma pê rind silasnayê. Ezo Zeki ewja ra silasnena. O min ra qijkek bî, cok ra embazê birayê min o werdiy bi, la belê jew fin ma piya wextên weş ravêmayî. Ma mehla de kay, kay kerdî, erdan miyan de piya peme arêdayî, qazme dayî piro û rojê jî piya Roşanê l'ê Gulan piroz kerd. A piroz kerdinê l'ê Gulana 1979'î qe min vîr nêşina.

Embaz Zeki nêşibi dibistan. Verî wendinê ci çinêbi, la belê bahdoyê 12'yê îlonî de seferbelixê nûstin û wendinî de teber ra şî dibistan û hîrê mangan miyan de diploma xoya sifteyin girot. Wexto ke wendin misa, pêsero zaf pirtûkî wend û xo tayna ver-aver berd. Heme çî ebi seroyê xo kerdê û berdê sere. Ey peydemin ra qet hez nêkerdê û çend ke ci dest ra ameyê jî mêjgê xo kerd pir. Bahdo jî şî kursê karetey. Karete de xo xeylê varaver berdbi. Wayirê cayê keretey çepê tirkan ra bi. Bahdoyê şiyina embaz Zeki, min wayirê cayê kurs dî. Ey embaz wina ardê ziwana: "Zekî her gi roj, xo tayna veraver berdê. Miyanê roja ke amê û roja ke şî de, xeylê ferq estbi. Ey kiştê ra kareteyê xo û kiştê ra jî fikranê xo hewl berdê veraver. Ma heme çî de ûmûşê pê biyê, la belê meselê netewê kurdan sero fikranê ma pê ra abiryayê. Ma pirtûk dayê ci ke, tayna vera ma bêro, la belê ma weynayê ke ey pirtûk ra meselna veta û arda ma ver. Ey fikr û waştinanê xo qet nênimite û heme çî eşkere ardê ziwana. Cokra jî ma ci ra zaf hez kerdê û rûmet dayê. Wa embazê kesî bibo û zey Zeki bo. O rojê ma ra

abirya û şî; fina jî pey ser nêame."

Karkeran sera 1979'î de şaristanê Mêrsîn de jî roşanê xo yê l'ê Gulanê piroz kerd. Roja verîn, birayanê mayên pîlî soz dabî û ma rê vati bi: "Mayê şima ji xo de berê roşan. Xo hadre kirê." A şew ma kêf ra zaf berey rakewtî bî, şewra ma hewn ra vera di-hîr weriştî ke ê rewna ra şiyê Mêrsîn. Ma jî mehla de arêbyayî pê û xo miyan de qerarê pirozkerdina roşanî vet. Ma pankart de ebi kurdiya û ebi tirkiya "Bijî 1 gulan" û 'Yaşasın 1 Mayıs' nûst û ci peyde rêz bi. Ma xeylê geyrayî û bahdo jî ameyî kêberê faşistan ver. Faşistan ebi qeç û qulanê xo ya, ebi çîwayana ma rê vardayinê viraştî. Na vardayin de ma û faşistan zaf dayî pêro. Ney lecî de embaz Zeki jî est bi.

O rind yeno min vîrî. Embazî jew çîwe cinêka faşistan ra girot, xo dest û kewt înan miyan. Zey vergan vera înan dayî. Ma jew laceko faşist ci dest ra ebi zora vet. Zeki jî werdiyê koma ma bi, la belê zaf şirêgnay bi. Bahdoyê lecî ma ravêrdî taxa xo. A tax de ma veyn da ci û ci rê vat: "To kerdê lacek bikiştayê, hind jî nêbeno. Ê qedê ma nêbenê. Ma waşt ewja ra dirûşmeyê xo berzê û ravêrê. La belê îna tersî ra vardayin viraşt, ma jî nay sero înan ra xo parêznay. La belê to merg ra da înan ro. Ma winî beno embaz?" Ney persê ma sero, ey wina vatbi: "E weli min zerî ra da înan ro. Min çend ke dayê ey kutikî ro hind jî zerya min biyê honik. Beno ke fina o firsat nêkewo min dest. A bîn jî kutik merd merd, ez se kera, no lec o. Lecî de heme çî jî yeno kesî sere." Laceko ke ey dabi piro, di qatê embaz Zekiy bî. Wexto ke Zeki dayê piro, winî qîrayê ke ma ci ra tersay bi. Ma vat laceko bimro.

Ey lecî peyra ma miyan de qedrê Zeki zaf bî vêşî. Wexto ke bi şew ma dêsan sero dirûşmey nûstê, ma Zeki jî



xo de berdê û pawitina quncik dayê ey. Çimki ey mesûleya xo weş ardê ca û qet çiyê jî goşanê xo ser ra nêeystê. Serê ci werdî bî. La belê mesûleya xo weş zanayê.

Şewê ma dêsan sero dirûşmey nûstê. Nê dirûşme, bandorê tirkan û faşistan sero nûşayê. Zek yeno min vîr, ma pañç-şes embazî a şew vejyayî. Ê embazan ra jew jî, embaz Zeki bi. Ma de jew tabanca jî estbi. Ma xo zey şoreşkeran dişmenî ra pawitê. La belê şewê jî lec nêvejya û cokra jî ma qet a tabanca nêteqne jî. Çimki ma mehla xo ra dîr nêkewtê û nêşiyê kuçên faşistan. A şew ma karê xo qedîne bi ke, lingê min kewt çalê miyan û gunaya sîtilê boyaxî ro. Boyaxa sîtilê pêriko rijyê min sero. Ez, cor ra heta cêr boyax miyan de menda. Boya ma zaf bibi teng û ma ebi qahra, şim qenela aw sero ke xo bişiwê. Ney teşxelî de min tabanca dêsi bind de vîr kerd. Ma kiştê ra çinayên xo sîte û kiştê ra jî kewtê awa qenal. Vera şefaq, çinayê xo yên hî da xo ra û şîrê keyî ke, min weyna tabanca çiniya. Ma a kişt de, na kişt de geyrayî tabancay, la belê ma nêdinê. No mabên de roj akewt bi. No fin ma nêwetayê şîrê, herûndê xo de bigeyrê, çimki mayê dişifre biyayê. Embaz Zeki

werdiyê ma bi, coka ma no gurmê da ey. Zeki qederê nîm seat tepya ebi tabancaya ageyrê. Kêfê ci zaf weş bibi. Tabanca da ma û wina vat: "Ney ra tepya kargî şew ez jî wazena şimaya bêrî, min ney karê ra zaf hez kerd. Niwisên ma ê desî weş xemilnaybi. Ma emşo xeylê ca de dirûşmey nûstê. Qe ca yê jî veng nêmendo. Wele bile min ney karî ra zaf kêf girot." Embazê ma wo delal û şîrîn Zekî, eke malbat de beno û eke mehla de beno zaf hezkerde bi. Embazîna xo de jî zaf akerde û camêrd bi. Kesî ey ra zerî girotê. Ma heta sera 1987'î pê diyî. Bahdoyê na ser o amê bi Stenbol. Stenbol de hindê serê xeftiyeno û a sere de şino teberdê welatî.

Dewreyê Akedemiya Mahsum Korkmazî de maneno. Akedemî ra tepya, demeyê şarê Başûrê Werdi miyan de xeftiyeno. Sera 1989'î de jew koma gerîlaya wazeno ravêro bakurê Kurdistan. Na ravêrin de, awa Dicle sero ebi leşkerên Tirkiyayê ra lec vejyeno. Rojê heta şan lec qut nêbeno. O ebi embazên xo ya mabênê Cizre û Silopî de awa Dicle ver de şehid kewno. Mayê vam, embaz Zekiyo qe vîr nêbo.

ZÜLKÜF KIŞANAK



Silav li te şehîdê bédeng  
Silav li te mêrxasê Amedê  
Silav li te meşaleya Wanê  
Silav û şabaş  
ji malbata te ya serêfiraz re

Heval M. Şirin Tekin di 3'ê gulana 1988'an de ji aliye faşistan ve li Zanîngeha Yüzüncü Yıl ê hat kuştin. Şehadeta Heval M. Şirin ji me re bû meşaleya têkoşinê bi şehadeta wî me ew baş nas kir. Gurên boz dîsa bi destên xwe gora xwe bi kuştina Heval Şirin kola li Wanê.

Heval M. Şîrîn di bin şehadeta te de em soz didin û sond dixwin. Wê Kurdistan bibe goristan ji faşistan re!

**M. Şirin Tekin**

**XWENDEVANÊN WELATPARÊZ ÊN ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YIL A WANÊ**

□ 13 Gulan 1974:

**Leyla Qasim hate dardekirin**

Şoreşgera kurd Leyla Qasim, di dema serhildana gelê kurd a li dijî sistema Sedam de, kete destê hêzên rejîma faşîst. Di dema dîlbûnê de wê serî netewand û li ber xwe da, îşkence û pêkûtiyeke bêhempa lê hate kirin. Ji bo ku bibe îrâfkar singa wê bi kêrê birîn, lê wê ev yek nepejirand. Rejîma Bexdayê roja 13 ê gulanê ew bir ber sêdarê û daleqand.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 5 Gulan 1963:

**Rojnameya "Roja Newe" dest bi weşanê kir**

Hejmara yekemîn a Rojnameya "Roja Newe" di 15'ê gulan 1963'yan de li Stenbolê derketiye. Wisa diyar e ku, bi tenê ev hejmara wê ya yekemîn çap bûye. Di bin navê rojnameyê de ev îbare heye: "Mehê carekê bi kurdî-tirkî derdikeve, rojnameyê de edebî, fikrî û siyasî ye" Tiştêkî din ê ku bala mirov dikişîne ev e ku, navê rojnameyê bi zaravayê dimilkî (kirmanckî) ye. Roja Newe, rojnameya kurdî ya pêşîn e ku cih daye nivîsên kirmanckî angî dimilkî ye.

*Awêneyeke ku berê wê dane rastiye:*

**"Awêne"**

Xelata îsal ya Mîhrîcana Stenbolê ya Navneteweyî ya Filman, derhênerê îranî Cafer Panahî, bi filmê "Awêne /Ayna" wergirt. Festîvala ku di navbera rojên 18 avrêlê- 3 gulanê hate sazîkirin, ev cara 17. ku tê lidarxistin.

Awêne, ji çîrokeke şahîk û xwerû pêk tê. Film taybetmendiyên sînemaya Îranê ya pêvajoya dawîn, li xwe bar kiriye. Di filmên îranê de çîrokeke ji rêzê, şîrovekirineke xwerû û dîmenên rasteqînî û yên gelekî ji rêzê, xwe didin xuyakirin. Bi giştî bûyer li dora objeyê diçin û tînin. An jî em jiyane dikarin bi wê objeyê ve girêdayî, bibînin. Ev carinan wekî cerikekî, wekî masiyekî di şûşeyê de an jî wekî mersî-kekê xuya dibe. Carna jî wekî di "Awêne" de tê dîtin, dibe ku zarokek be.

Film, bi gera Mîna ya nav bajêr dest pê dike. Mîna ya biçûk tenê digere. Ji ber ku diya wê, ew ji ber dibistanê hilneaniye. Ew bi tena serê xwe berê xwe dide malê. Otobasa ku ew lê siwar bûye rast e, lê aliyê ku ew diçe şaş e. Di van dîmenan de temaşevan, bi çavê Mîna li tiştên ku di otobosê de diqewimin, temaşê dike.

Di film de, eletewşiya helwesta Îranê ya li ser tîkiliya jin û mêran jî hatiye berbiçavkirin. Kesên zewicî, dema li otobosê siwar dibin, ji hev vediqetin û yek diçe beşa jinan yê din diçe beşa mêran. Ev yek di film de, bi rewşa du kesên nû zewicî tê destnîşankirin. Ev li aliye-kî, keçikeke 8 salî derbasî beşa mêran dibe, ev kesa 8 salî ji beşa mêran tê derkirin. Di van sahnayan de rexneyên veşarî li rêveberiya îslamî hatine kirin. Gava otobos digihêje rastwestgeha dawîn, Mîna, winda dibe. Piştî vê yekê, mirov li astengiyên li ber zarokan, ku

nahêlin ew rewşa xwe ji mezinan re vebêjin, rast tê. Ango mirov tîdighêje ku, mezin ji rewşa zarokan fêm nakin.

Hewldana Mîna ya ji bo dîtina mala xwe, di nav kolan û riyên Tahranê de, ku gelekî dişîbin bajarên welatê me, didome. Bi mirov wisa tê ku, mirov li serpêhatiyê rastîn, temaşê dike. Lê ev rewş heya ku Mîna dibêje: "Baş e! Ez nema dixwazim di vî filmî de bilîzim" berdeyam dike. Li ser vê yekê, ji salonê piqînî û ken bilind dibe. Mirov pê dihesê ku, tiştê ku wî heta lê temaşê kirine "film" bûye. Zarok kincên xwe ji xwe dike û ji otobosê peya dibe. Bi baweriya Mîna, problem ji ber derhêner pêk tê, ji ber ku ew dixwaze ku çavên wê wekî kal û pîran xuya bikin. Her wiha hevalên wê jî, ew wekî mizmizok bi nav dikirine. Beramberî hewldanên xebatkarên setê film, Mîna jî berê xwe dide mala xwe. Lê, vê carê bi rastî nîzane ku mala wê li ku ye û winda dibe. Piştî vê yekê kameraman didin pey Mîna û film dibe bûyereke rastîn. Bi şeweyekî din film dibe awêne (ayna) û rastiye dide der.


Di film de temaşevan li ser rewşa siyasî û çandî ya Îranê jî agahdar dibe. Problemên ku bi bertilan diçin serî, jinên ku di malan de tînin asêkirin, bi şewaza sînemaya Îranê tînin raberkirin. Di film de, zarok ji jinekekê re dibêje: "Ma bi darê zorê hin tişt bi te jî dane gotin?" Di nava van dîmenan de hemanên dijber û serhildêr berbiçav in. Her wiha li dijî pîvanên hunerî yên kevnare jî dijberî û rapêrînek xwe dide pêş.

Lê di film de, di warê şewaz û rêbaza sînemageriyê de hin kêmasî ne ku tune ne. Bes awênêbûna rastiye, tîrî sînemayê nake.

KAZIM İKSOR

**ÇAVDÊRÎ**

Qehremanî û rebenî  
jî hinekî di destên  
mîrov de ye



MÎRHEM YÎÇÎT

Teyrek di nav refê xwe de xurt e. Yê ku ji derûdora xwe vediqete, zû an dereng dibe nêçîra neyarên xwe. Mîrov jî wiha ne. Heta mirov di nav heval û hogirên xwe de be, mirov xwedî rûmet e, şarezahiya mirov bi kêr tê û dijmin jî hesabê mirov dikin.

Bi nîmûneyeke din jî mirov dikare vê tîkiliya nav ferd û kolektîvê de, perçe û tevayê hinekî din ji hev derxe û çend mûyên din veke. Em rewşa febrîqeyekê bifikirin, febrîqeyêke mezin. Parçe û burxeyên wê zaf in. Her yek jî wan di cihê xwe bi karekî radibe. Di nav tevayê de erkeke wan heye. Burxeya ji cihê xwe de derdikeve, şor û xirek dibe, dipeke tenîştan, êdî ne ew burxa berê ye û dimîne perçeyek hesinê bêfonksiyon, li rastê û ji avêtinê re. Dibe malê xurdexaneyê û bi kêrî tiştêkî cidî hew tê.

Daristan ji daran tê pê. Darin hişk dibin, dikevin ber şapeyên bi vî rengî yan bi rengê din. Hin kurrî dikevin wan, di reh û û gewdeyê wan de nexweşî peyde dibe û ji darîtiyê dikevin. Hin berq li wan dixê, gêr dibin, dirizin û diçin. Beşek dibe ziblê axê an jî dikeve ser ardû û şewata pêwîst.

Tevgera Rizgarîxwazî li Kurdistanê mekanîzme û febrîqeyêke mezin e. Bûye tevahiyeke herafî, seranserî û pirşaxî. Her şaxekê bi sedan û bi hezaran şeraxên wê çêbûne. Şikestina şeraxekê, gulfî û çuqulekî ji bo kesê ku haya wî ji daristana bêsêrî û bêbînî heye, bi xwe re li berketînekê çêbike jî, nabe xemeke domdar.

Şervanekî duh bînin ber çavên xwe. Raboriya wî dema di nav rêzên şervanan de bû û rewşa ya îro, ku wî xwe xiste nav lepên dijmin bidin berhev. Dema fermandekî Tevgera Rizgarîxwazî bû, çekê azadîxwaziyê li milên wî bû, bi rextan rapêçayî û çikçikandî bû. Cihê pê lê dikir dihejjiya, kezêb û ziravê dagirkeran jê diqetiyên. Lê îro wiha ye? Na! Roja raxerîtiyê jî rê derket, demara xerabiye ew jî rê bir; nebaşî li rindiya wî, dudilî li qerardariya wî, hesabên kirêt li mîrxasî û ciwamêriya wî, serberdayî, jixweweyî û bêperwayiya wî, li berpirsiyariya wî siwar hat û çend aliyên wî yên çê hebûn giş daqurtandin. Bi gotinê din roja qelş derket, bû û pûç, Xwedê jê stand, mesex û kor bû, xwe avête bextê PDK'ê, dev ji rîya serxwebûnê û rûmetê berda, bû mirovekî din û çend sed dereceyan kete bin her mirovê asayî. Edî ne sira wî û ne ew kerameta wî ya caran û ne jî saw û xofa dewletê jê ma. Qehreman û betlê me ma feqîrekî Xwedê û evdekî ser reş. A li vir zora wî çû, çira wî vemirî û qirdê wî piştî xwe dayê.

Dewlet pesnê xwe dide: "Heta tu çavên xwe bigirî û vekî, bi destlepkê bê ku xwe tev bidin, me ew û birayê wî girt û ji Hewlêrê anî Amedê." Baş e, tamam! Lê çima zemanê ew li serê çiyayên Kurdistanê; li Dêrsimê, li Amedê û li Botanê bû, dev ji "revandina wî" berdin we newêrîbûnê zîtkî siya wî bibin. Hewce nake mirov bibêje ku mesafa nav Enqere û Hewlêrê ji ya nav Dêrsim û Enqereyê gelekî dûrtir e. Heger tiştê ku we li Hewlêrê kir, we nikarîbû li Botanê bike, ji ber wê bû ku girtiyê we duh şervanê welêt bû û bi navê şoreşêke mezin qise dikir, hêza xwe ji gelê kurd digirt. Lê îro rewş cihê û berevajî ye.

Me behsa mesexbûnê kir. Mesexbûn ne layiqê mirovan e û ev mesexbûna piştî ewqas xwêdan û qiriktehlî mirov diêşîne, dilê mirov diguwişe û bivê nevwê mirov li ber dikeve, heta hêrsa mirov radibe.

Qedera însên hinekî jî di destên însên de ye. Hinekî jî mirov mesûl e, ji tiştên tene serê mirov. Şoreşa gelê me çiyayekî bilind û fireh e. Kevîrek jê gindiriyê ne xer e. Kevîr di cihê xwe de mabûya baştir bû. Dil wiha dixwaze. Belê rastî li dil nanihêre û bi dewla dil naçe avê. Dîrok jî karê xwe dike kê çî nay heq kiriyê, wî navî li wan dike.

# Ji NÇM'ya Edene

## Muzîk; nikare civakê serobin

**K**oma Rewşen kengê hate avakirin, heta îro xebatên çawa kirine?

✓ Koma Rewşen, di sala 1995'an de di bin banê NÇM'ê Edeneyê hate avakirin. Wê demê di nav karûbarê saziyê de, bi tenê beş hebûn, lê kom tunebûn. Di şahî û çalakiyan de endamên beşa

Country e". Heger hûn bibêjin, divê hûn navekî li muzîka xwe bikin, wê demê em dikarin bibêjin, muzîka me "Muzîka Ezmûnî (Deneysel Müzik)" ye.

*Li gorî we, di hişyarbûn û zanebûna civakê de rola muzîkê çi ye?*

Mixabin huner û hu-

vayê derketiye, ji bo me rûmeteke gelekî mezin e. Ev rûmet ne bi tenê rûmeta Koma Rewşen e, her wiha rûmeta gelê kurd û xwedî derketina li biranîna rûmeta şehîdan e jî. Kasetê coş û hestên me gur kirin, ji bo pêşerojê ji ramanên me xurt kirin, da ku em bikaribin ji bo gelê xwe berhemên hîn baş û qencir biafirînin.

*Serkeftin û kêmasiyên we çi ne?*

✓ Bi derketina kaseteke wiha hêviya me ya herî mezin xwegihandina gel bû. Berhema ku me derxiste holê, em dikarin bibêjin ku bi derengî jî ketiye. Gelek girîng bû ku me destên xwe dirêjî gel bikira, lewre mesajekê me ji bo gel hebû. Me bi riya mesaja xwe dixwest ku, em tiştên xweş ku ji aliyê qeh-



Koma Rewşen di şahiya piştgiriyê ya HADEP'a Seyhanê de tê dîtin.

muzîkê, hemû radibûn bi hev re diçûn cihê ku şahî lê hebû. Ev yek jî dibû sedema problem û aloziyên berbiçav. Di warê bernamê û projeyan de em zêde qels û lawaz bûn. An tunebûn, heke em hebûna jî me bersiva pêşerojê nedidan. Ji bo ku em rê li ber van gengeşî û aloziyan bigirin, me biryar girt ku em komekê damezirînin. "Koma Rewşen" bi vî awayî hate avakirin. Di pêvajoya 3-4 salan de, komê di gelek şahî û çalakiyan de di cih girt û di xebatên beşa muzîkê de xebatên girîng pêk anîn. Her wiha di nav xebatên beşa muzîkê de bi navê "Şitlên Azadî" komeke zarokan hebû. Şayanî gotine ye ku ji nav wê koma zarokan, gelek hatin perwerdekirin, îro çend ji wan di nav beşa muzîkê de û di nav komê de, bi awayekî serkeftî kar dikin.

*Her çiqas kasete "Çiyayê Bêzar" ji aliyê stranên geleri ve têrtîji be jî, di hin stranên de motifên "Rock" û "Country" xwe didin der. Gelo hûn çi navî li muzîka xwe dikin?*

✓ Her çiqas bi awayekî kêmbê be jî, şewaz û motifên Rock û Country di nav kasete me de hene. Lê zehmet e ku em bibêjin: "Muzîka ku em dikin Rock an

nermend rola xwe ya dîrokî bi cih neanîne. Ji ber vê yekê jî em dibêjin divê hunermend bibe neynika dema xwe. Hunermend tiştên ku di nava jiyana de wekî zordariyê, êşê, nexweşiyê, qehrê, kêfxweşî û hestên dilê gel bîne ser zimên û hunera xwe bi awayekî zanistî ragihîne gel.

Di nav şaxên hunerê de, yê ku bandora herî mezin li gel dike û jiyana kevn diguherîne ango hest û ramên mirovan bi pêş ve dibe, muzîk bi xwe ye. Lê, hêleke din jî heye; gava îro em muzîka kurdî di ber çavan re derbas bikin, wê gavê wê bê dîtin ku çiqas tesîr li civaka kurd kiriye. Bi rastî jî muzîka kurdî rol û wezîfeya xwe ya girîng baş neaniye cih. Di zanabûn û hişyarbûna civaka kurd de, bandora herî mezin têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê ya çekdarî û siyasî kiriye. Divê mirov ve rastiye înkâr neke û xwe nexapîne. Bi kurtasî muzîk; jiyana civakan nikare serobin bike, bi tenê dikare jiyana mirovan bêhtir rengîn û berbiçav bike.

*Cara yekem ji NÇM'yên Çukurovayê Koma Rewşen kasetek derxist. Gelo ev yek bû sedema hestên çawa?*

✓ Bêgûman berhema ku ji Çukuro-

Dema ku em li Edene, Mersîn, Ceyhan an jî Tarsûsê bûn, me digot: "Heft xwezî bi Kurdistanê" lê piştî ku em çûn deverên mîna Stenbol û Îzmîrê, vê carê me got: "Xweziya me bi Edene û Mersînê" Balkêş e rewşa Ewrûpayê jî ya Stenbolê hîn jî xerabtir û kambaxtir e.

*Koma we ji çend kesan pêk tê, çiqas ji wan amûrên muzîkê lê didin û navên wan enstrûmanan çi ne?*

✓ Koma me, ji heft kesan pêk tê. Ji nav heft hevalên me, şeş ji wan dikarin amûrên muzîkê lê bidin. Amûrên muzîkê ku hevalên me bikarînin ev in: Baxlama, ney, flût, bas gîtar, elektro gîtar, baterî.

*Eleqedariya gel beramberî kasete we çawa bû?*

✓ Her çiqas rexneyên neyînî li me hatibin kirin jî; bi giştî gel eleqeyeke baş ji bo kasetê nîşan da. Ji ber ku NÇM'ê li Çukurovayê cara yekem kasetek derxist, bi piranî li vê herêmê kaset baş hate firotin. Li bajarên Kurdistanê jî eleqedariya ji bo kasetê baş e.

*Hûn dikarin serpêhatiye strana "Çiyayê Bêzar" ji xwendevanên me re bibêjin?*

✓ Çiyayê Bêzar dikêve ser herêma Semsûrê (Adıyaman). Di sala 1993'yan de li Çiyayê Bêzar 28 heval bi çekên kimyewî û bi awayekî hovane hatin kuştin. Ji bo biranîna wê roja reş, ev helbest ji aliyê Hesen Zinar ve hatibû nivîsandin. Me xwest ku em muzîka vê bûyera dîrokî çêbikin.

*Bi derxistina kaseteke wiha, hêviyên we çi bûn? Hûn çiqas gihîştin armanca xwe?*

remanan hatine afirandin, di awazên xwe de bidin jiyandin.

Em nikarin pesna xwe bidin û bibêjin me serkeftineke mezin bi dest xistîye. Bersiva vê pirsê dê gel bide. Lê em dikarin kêmasiyên xwe bibêjin. Li gorî me kêmasiya herî berbiçav, qelsiya wêjeyî bû. Dîsa rastiya komê di kasetê de xwe zêde diyar nake. Em vê ka-





# Lê Koma Rewşen:

## bike, lê dikare rengîntir bike

setê ji bo kar û lebatên xwe wekî destpêk dinirxînin.

**Demek berê hûn ji bo konseran çûn Ewrûpayê. Gelo hûn dikarin behsa çûdahiyên di navbera Ewrûpa, metropolên tirk û Kurdistanê de bikin?**

✓ Em berî Ewrûpayê, çûbûn Amed, Ruha, Semsûr û Meletiyê. Bi rastî jî wê gavê, em bi germahiya têkoşînê hesiyar. Li van herêmên Kurdistanê çêşeke mezin hebû û ev yek jî ji ber germahiya têkoşînê bû. Mixabin em vê yekê nikarin ji bo Ewrûpa û metropolên Tirkiyeyê bibêjin. Dema ku em li Edene, Mersîn, Ceyhan an jî Tarsûsê bûn, me digot: "Heft xwezî bi Kurdistanê" lê piştî ku em çûn deverên mîna Stenbol û İzmirê, vê carê me got: "Xweziya me bi Edene û Mersînê". Balkêş e rewşa Ewrûpayê ji ya Stenbolê hîn jî xerabtir û kambaxtir e. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku, çiqas tu ji welatê xwe dûr bikevî, tu dibî mîna sêwiyê ber deriyar. Çûdahiya di navbera Ewrûpa, metropolên Tirkiyeyê û Kurdistanê ji bo me normal e. Ji ber ku li welêt şereke dijwar îro diqewime. Hinek kes di nav şer de, di nav bêderfetiyan de li ber xwe didin, da ku tiştên birûmet biafirînin. Lê li metropol û Ewrûpayê rewş ne wisa ye. Mirov gava ku ji çavkaniyên xwe dûr bikeve, di be biyaniyê neteweya xwe. Însanên ku kapitalîzmê nas dike, ji hestên xwe gelek tiştan winda dike. Ev jî rastîyêke kapî-

talîzmê ye. Li Ewrûpayê gava bandora têkoşînê tune be, wê gavê mirovati jî namîne.

**Jiyana kurdên Edene, Mersîn, Ceyhan û derdorên wê ji bo xebat û lebatên we çiqas bû sedema îlham û feyzê?**

✓ Jiyana kurdên Çukurovayê ji jiyana Kurdistanê zêde ne cuda ye. Însanê me yê koçber, bi xwe re orf û adetên xwe, çêşên xwe yê welatparezî, êş û azarên xwe jî anîne. Feyz û îlhama me jî ew in, çavkaniyên me jî ew in.

Însanên ku berheiman diafirînin, divê qadan û bingehan nedin ber xwe. Fikrên wiha jî li gorî me çewt û şaş in. Afirandin qade û bingehan nas nake. Karê hest û ramanê, dibe sedema bingeha afirandinê û di afirandine de sinor nîn e.

**Ji bilî xebatên ji bo muzîkê, di têkiliyên we de, navbera we û zimanê kurdî çawa ye?**

✓ Mixabin di nav komê de hinek hevalên ku bî kurdî nizanin hene. Yê ku dizanin jî, zêde napeyivîn. Ev yek jî kêmasiyeke mezin e. Em dixwazin vê kêmasiyê-rojek beriya rojekê ji holê rakin. Hinek hevalên me jî nû hîn dibin; xwe dikarin îfade bikin.

**Navbera we û notayan çawa ye?**

✓ Di nav me de hîn xebat li ser perwerdehiya notayan jî tên kirin. Endamên komê, ji beşa muzîkê re li ser nota, gîtar ney û baxlamayê, ev demek e ku dersan didin.

**Dema hûn li ser beste û bikaranîna muzîkê dixebitin, hûn qade û bingehên çawa didin ber xwe?**

Bi gelemperî dema em dest bi karekî dikin, em difikirin gelo xebata ku em bikin wê bandoreke çawa bike, aliyên

neyînî û erênî wê çî bin? Li hêla din em gelekî girîngî didin aliyê hunerî. Her wiha em her gav reaksiyona gel li ser xwe hîs dikin. Tiştêkî din jî heye, hunera ku em dikin pêwîst e gavek li pêşi-

bestiyê dîr in. Ji vir şûn de em dê hewl bidin xwe ku helbestên serbest jî bikin stran.

**Bi baweriya hin kesan divê çand û**



Koma Rewşen: Ji aliyê çepê, Salih, Bülent, Mazlum, Serdan, Sinan, Harun, Gülcan

"Şopandina hunera Prometheusê nûjen ê ji yezdanên xerabiyê agir dizibû û fêmkirina evînen giran çiqas dijwar be, şopandina hunera wî jî ewqas dijwar bû û mijûlbûn divêt. Di germahiya Çukurovayê de, bi qasî ku me jî vê evîna bi rûmet fêmkir, pirtir jî bi êş, şahî, awaz û rista wê, me xwest ku em dilvînen xwe bînin zimên. Carinan bang, carinan dûrika dayikekê, carinan qêrîna zarokê/e, carinan jî jiyana ku dixwestin bikin dogeh, di xebatên me de derket pêş."

ya gel be.

**Astengî û pîrsgirêkên li ber we...?**

✓ Geşbûn û berfirehbûna xebatên me girêdayî saziyê ye. NÇM'ya Edeneyê ji bo me teng e. Salonên me hatine morkirin. Lewre jî em nikarin di bin banê saziyê de xebatên xwe pêşkêşî gelê xwe bikin. Ev yek jî dibe sedema lipaşmayînê. Lê em dîsa jî dixwazin di nav dijwariyan de hin tiştan biafirînin.

**Helbestên ku di kasetên komên NÇM cih digirin, hema bibêje giş bi "kêş û rêzbandî" hatine ristîn. Çima hûn hûn helbestên serbest nakin-stran?**

✓ Di kasetê de bes strana Licê, li derveyî şewaza rêzbandî ye. Ev stran bi awayekî serbest hatiye nivîsandin. Belê rast e, bi gelemperî stranên din ji ser-

**huner ji siyasetê dûr be. Hûn jî bo vê dîtinê çî dibêjin?**

✓ Em bawer in, mafê her miletî heye ku, bi zimanê xwe bipeyive û binivîsîne. Li welatê me, ev mafê me yê xwezayî jî destê me hatiye girtin. Li vir jî kurdayetiyê mirov nikare behs bike he-ta roja têkoşînê. Em xwe li dûrî siyasetê nabînin û nikarin bibînin jî. Ne ji siyasetê têkoşînê bûya, îro dê kurd jî tunebûna. Gava kurdayetî tunebe, kes nikare bibêje çand û huner jî heye. Huner bûyereke civakî ye û em jî civakê ber-hema civakê ne. Şoreşa ku li welatê me berdeyam e, di qada çand û hunerê de jî rola hişyarbûnê bi cih anîye û kes bila nebêje çand û huner bila ji siyasetê dûr bikeve. Em hunermendên NÇM'ê jî dibêjin, gerek e hunermend dûrî siyaset, jiyana gel û şoreşê nebe.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Gava îro em muzîka kurdî di ber çavan re derbas bikin, wê gavê wê bê dîtin ku çiqas bandor li civaka kurd kiriye. Bi rastî jî muzîka kurdî rol û wezîfeya xwe ya girîng baş neaniye cih. Di zanabûn û hişyarbûna civaka kurd de, bandora herî mezin têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê ya çekdarî û siyasî kiriye.

*Qêrîneke Xwedayî:*

# Cubran Xelîl Cubran

Ez û perav evîndar in, hezkirin wan nêzîkî hev dike û ba wan ji hev dût dixîne. Ez ji pişt şevqa şîn der tîm, da ez kefa xwe ya zîvîn nexim nav qûma wê ya zêrîn. Her sipîd, ez di guhê yarê xwe de şerîeta evîne dixwînim, min hambêz dike... her êvar jî ez bi nimêja bêrîkirinê şa dibim, min maç dike...

## Hinek sirûd ji sirûdên Cubran:

\*Sirûdek: Di kûraniya derûnê (ruh)

min de sirûdek e, gotinan ji xwe re nake kiras. Sazek e di nava dilê min de dijî, naxwaze bi dîwî-tê re biherike ser rûpelê. Hestên min radipêçe û wekî hingiv ji ser zimanê min naheke. Çawa ez ê derînim û ditirsim ku ba lê rabe. Ji kê re bistrêm û ez di nava xwe de dijîm, ditirsim ji ziviriya guhan!!

Ku tu li çavên min binihêrî, te xeyalê wê bibînî û ku tu dest bidî tiliyên min, tuyê bi lertzîna wê bihesî.

Destkarê min, wê tînin xuya kirin, wekî çawa di golê de şewqa stêrkê xuya dike, hêstirên min wê diyar dikan, wekî çawa xunav raza gulê diyar dike, dema germahî wê belawela dike, sirûdeke bêdeng wê belav dike û xirecir wê ditewîne, xewn wê dibêjin û hişyarî wê vedîşerin.

Sirûda evîniyê merivno! Gelo kîjan Dawîd\* bi pîrozî wê dixwîne? Ew ji bêhna yasemînê xweştir e. Gelo kîjan gewriyê ew kiriye kole? Kî dikare xumxuma pêlan û çivçiva bilbilan bigihîne hev? Lehiyan û kesera zarokan bide ber hev?

Kîjan meriv dikare sirûda Xwedayî bistirê!!!

## Sirûda pêlê:

Ez û perav evîndar in, hezkirin wan nêzîkî hev dike û ba wan ji hev dût dixîne. Ez ji pişt şevqa şîn der tîm, da ez kefa xwe ya zîvîn nexim nav qûma wê ya zêrîn. Her sipîd, ez di guhê yarê xwe de şerîeta evîne dixwînim, ew min hambêz dike... her êvar jî ez bi nimêja bêrîkirinê şa dibim, min maç dike...

Ez bêcir im, bêsebr im û yara min dostê aramê ye û hogirê deyxê ye.

Çendî min li dora horiyên deryayê dîlan dikir, dema ji kûraniya derya derdiketin û li ser stûnan rûdiniştin, da li

lindahiyên dawêşandine, surîşt newalan bi min şa dike.

Ez gewher im xweşik im, ji taca Eşterût\*\* belav bûme, keça sibehê ez dizîme û bi min gulistan xemilandine. Dema ez digirîm kaviil dikenin, ez xwar dibim, gul dibişkivin, ewr û bîsttan du evîndar in û ez jî peyk im, di navbera wan de. Dengê tavê û şûrên birûskê, mizgîniya hatina min didin û keskesor dawîya rêwîtiya min tîne.

Ev e jiyan, li ser lingên zêviya ingirî dest pê dike û di nav destên mirina bêdeng de bi dawî dibê.

Ez ji hinavê golê radibim û li ser baskên bayê dimeşim, ku ez baxekî xweşik dibînim, dadîkevim, lê lêvên gulên radimûsim û tîlên daran hambêz dikim.

Di bêdengiyê de ez bi tiliyên xwe yê nermik li camên pencereyan dixînim, ew lêdan dibin awazeke xweş, tenê yê hesttenik jê fêm dikim...

Ez kesera derya me, hêstira ezmen im û kenê bax im.

Ev e evîn, kesereke ji deryayê hezkirinê û hêstirekê di ezmanê ramanê de, kenekî di baxê derûn de.

## Perawêz:

\*Dawîd: pêxember Dawîd, pêxemberêkî Xwedayî

\*\*Eşterût: Xwedayê evîne û ciwanîyê.

## Çavkanî:

- Jiyana Cubran Xelîl Cubran (El Qewal)

- Nivîsên Cubran Xelîl Cubran çapa erebî (Mîxal' il Neim)

## Sirûda Baranê:

Ez tîlên zîvînî me, Xwedê ew ji bi-

## RÊWIYÊKÎ BÊRAWESTGEH

Di çîleya sala 1883'an de li gundê Bişîrrî li Lubnanê hate dinyayê. Cubran ji zarokatiya xwe de meyl-darê siruştê bû û wê yekê hezkirina nivîsandin û wênekêşîya pê re çêkir.

Di sala 1895'an de digel malbata xwe berî dan DYA (U.S.A). Cubran, li wir wêjeya cîhanê nas kir û roman û berhemên bi îngilîzî xwendin.

Di sala 1898'an de ji bo xwendina zimanê erebî û fransî vejeriya Lubnanê û li Beyrûtê di Înstutiya El-Hikme dest bi nivîsandinê kir. Di sala 1901'î de vejeriya Bostonê. Di wê serdemê de berê xwişka wî mir piştê birayê wî û peyre jî dayika wî jiyana xwe ji dest da. Lê disa jî wî dev ji nivîsandin û wênekêşiyê ber-neda.

Di sala 1904'an de pêşangeha xwe ya yekem ya wênekêşiyê li dar-xist û ji wê demê de Cubran kete meydana navdariyê. Ji sala 1914'an de hata 1931'ê de evînek di riya namayan re di navbera wî û nivîskara navdar Mey Ziyada de çêbû. Di sala 1931'ê de Cubran mir.

Cubran ne tenê nivîskar e, lê ew wekî ramanbîrekî di edeb û fikra erebî de bi cih bûye. Nivîsên wî tesîreke mezin li ziman û edeba erebî kirin û pirtûkên wî ji berê û heta niha jêder in ji hemû nivîsandinên ku li pişt wî derketin rê.

## Ji pirtûkên Cubran:

Baskên Şikestî; 1912 bi erebî


Ken û Hêstir; 1914 bi erebî

Keff û Qûm; bi îngilîzî

Mesîh Lawê Însan; 1923

Ji girîngtirîn pirtûkên Cubran ya Pê-xember, ku bi îngilîzî hatiye nivîsandin, li gelek zimanên cîhanê hatiye wergerandin.

Cubran Xelîl Cubran, bi destê xwendevanê xwe digire û wî dibe daristana. Wî bi siruştê dide nasîn, ezman, stêrk û giya tev dibin hevalên wî. Dengê zarokê di hinavê mirov de belav dibe, mirov bi hêsaniya ziman û dîmenan dihesê. Bi çûkan re çivçivê dike û bi heyvê re bêxew dimîne. Yê ku Cubran bixwîne bêyî ku hay jê hebe, dibe dilê romantîzma wî û bêyî ku zanibe janên wî wekî hêstiran diherikin. Yê ku Cubran bixwîne ne bi îradeya xwe xameyê hildigire û janên wî werdigerîne.



Ev wêne ji pirtûka Xelîl Cubran a bi navê Mesîh lawê Însan (Insanoğlu İsa) weşanxaneya Anahtar Kitaplar hatiye wergirtin.

Amadekar û werger:  
JANA SEYDA/ Başûrê Biçûk

NÇM-Stenbol

● 9 Gulan 1998 Şemf: Folklor, Koma Serhildan

"Şerînahiya aşî, birafî û yekîniyê"

"Aşûre" : Semah, muzik, defle Saet:14:00

Xwendina helbestan: "Bi zimanê helbestan guftûgo"

Helbestvan: Şûkrî Erbaş û Hüseyn Inan Saet:18:00

● 10 Gulan 1998 Yekşem: Konser: Koma Azad Saet:14:30

Dîwana Dengbêjan "Erbane" :

Xalê Baqî, Evdîlkerîm, Seyfedîn Saet:18:00

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM-Izmîr

● 9 Gulan 1998 şemf:

Roja Aşûreyê Saet:17:00

● 10 Gulan 1998 yekşem:

Konser, Hozan Cezmî Saet:17:00

● 15 Gulan 1998 în:

"Bernameya Bîranîna 18'ê Gulanê"

Amadekar: Komîsyona Ciwanênw HADEP'ê

## Çîroka têkoşer û îxanetkaran:

## Agirê Gel



Koma şanoyê Teatra Yekbûn, di sala 1993'yan bi vekirina şaxa NÇM'ê ya Edeneyê dest bi kar û xebatên xwe kir. Komê, 5 saliya xwe qedand û kete sala xwe ya 6'an. Teatra Yekbûn, heya niha gelek kurteşano pêşkêş kirine. Ji wan çend mînak: Mele û Bombe, Bacê Mirîşkan, Gava agir bi daristanê dikeve, Te ji bo welatê xwe çî kiriyê, Xewna şewitî, Di baxçê gulên de jina azad, Yekîtiya Neteweyan, Zilan.

Teatra Yekbûnê di nava meha avrêlê de, şanoyek bi navê "Agirê Gel", ku ji du perdeyan pêk tê, li Izmîr û Stenbolê pêşkêş kir. Derhêneriya şanoyê Gülcan Baştuğ kir. Şanogerên ku di vê şanoyê bi rol rabûne, Feyzullah Yıldırım, İdrîs Etruş, Mehmet Karakuş, Gülcan Baştuğ, Leyla Saraç, Birgül Keskin, Süleyman Kurhan e. Her wiha muzîka Agirê Gel ji aliyê şaxa NÇM'ya Stenbolê, kostûm ji aliyê Birgül Keskin û Leyla Saraç ve hatiye amadekirin. Di beşa teknîkî de jî Feyzullah Yıldırım û Alev Çamak bi kar rabûne. Di şanoyê de hin sehne ji kurteçîrokên Hasan Zinar hatine wergirtin.

Agirê Gel, çîroka ji nû ve afirandina gelê kurd e. Agirê Gel, helwesteke tûj e li hemberî xwespartin û îxanetê. Agirê Gel, li ber jiyana kevn serî hildide, li ser wê jiyaneke nû ava dike. Ji ber ku jiyana heyî, jiyaneke kevnereperest û feodal e. Agirê Gel, jiyana û hebûna xwe ji rizgariya gelê kurd werdigire.

Di sehneya yekemîn a şanoyê de, hevalbendîya Dîlan û Bedo tê rabeberkirin. Bavê Bedo cahş e, bavê Dîlanê jî bi karê qaçaxiyê debara xwe dike. Dîlan û Bedo bi hev re dilizîn lê bavê wan listika mirinê dilizîn.

Ji bo bavê Bedo Derbaso namûs pere ye. Lê ji bo bavê Dîlanê Naîfo pere di sînoran de der-

basbûn e.

Derbaso dixwaze Naîfo bixe kemîna leşkeran. Ji bo wê diçe qereqolê, îxbara Naîfo dike. Li aliyê din jî îxbara H. İbrahîm û Mistefa dike. Dibêje, ew alîkariya terorîstan dikin. Lê fermandarê qereqolê dibêje: "Kaçaxî baş e, lê teroristî nebaş e." Li ser van gotinan Derbaso şaş û metel dimîne û dibêje: "Teror were ez ê xeberê bidime we." Li gund, wexta ku Narê û Xelef dipeyîvin, temaşevan pir xemgîn dibin.

Di vê beşê şanoyê de, ew kurdê ku îxanet ji xwe re kiriyê kar û ciwanên ku ji bo azadiyê şer dikin, rûberî hev tînin kirin. Narê dema dibêje: "Xelef keç û xort bi hev re çûne sere çîyan." Xelef pir xemgîn dibe û wiha lê vedigerîne: "Xwezî ez jî bi wan be bûma!"

Di vê navberê de Derbaso, îxbariya Naîfo, Xelef û Rêzan dike. Riyên sînoran hemû tîne girtin û ji kemîne tenê Naîfo xelas dibe. Wê şevê ne asîman ne jî stêrkên asîman dîberiqin, bes şirqîna ewran û gurmîna birûskan e.


Di dawîya listikê de gundî li çayxaneyê rûniştine, Derbaso jî tê çayxaneyê. Lê ew tê daleqandin. Pereyan dixine dev û guhên wî. Paşê fermandar tê, guhên Derbaso jêdike û dibêje: "Min terorîstek kuşt û 800 milyon jî qezenc kir."

Bi kurtasî Agirê Gel ev e. Gelê kurd ji Agirê Gel pir hez kir, lê hin kêmasiyên listikê hebûn. Ev kêmasî jî, divê îxanet bêhtir derketa pêş, lê belê îxanet li paş mabû. Ji aliyê teknîkî ve jî, muzîk hilnedimî (tempolu) û ronahî kêmbû. Di warê bikaranîna zimanê kurdî de listik serketî bû. Her wiha li gorî listikên din şanogeran şarezatir xuya dikir.

A. WELAT/EDENE

## TÎŞK

## Raştiye



KAZIM TEMURLENK

Dîna dê 1980 ra dima xelê çî vuriya. Taye dugelî bî vila, tayê dūgelî jūbîn de kutî ceng, tayê dūgelan' dismenayîna werte xo darde we, haştiye ard. Tayê dugelan jî ze Tirkiye boyna dismenayîne tiz kerde, verva qomone bindest rê şayîne kerde.

Dewleta tirkî kuta wurto henan kê, hergu hetê xo de sayike milaketî tera biye, şiya xora bile şife kena. Cîrane xo bes niye dîna de kamçî welatê ke nameyê kirmancan bivero, desin dê dismen îlan kena. Werte xo de kam ke haştiye wazeno, kam ke ceng rind niyo vazero, xo dest de xayîn îlan kena. Partiyane Tirkiye de niyadamê sosyal demokratan ra bize (bigîr) hata lîberalano, muhafazakaran pero gile beçikane eskerî de gevj dane. Esker ke sa vazero, henî reng dane.

Raştiya Tirkiye gerek e rind bizanîme. Qe propoganda nêkeme. Hal û waxtê dewleta tirkî dîna zanena ke faşîzm ra qeyr tawa niyo. Onca eskeraw ke eskerê tirkî îdarê dewlete raver ra nat keşî nêdano. Dema ke wayire dewlete nika eskerê Tirkî yo. Îta ra ke raye kume vîneme ke muhatabê kirmancan esker o. Dema ke cengê Kurdistan de haştiye bibo nêbo, hetê dewlete de esker qerar dano. Na jî raştî ya. Hama çiyê esto ke xeyle waxt o vajîno ke esker haştiye wazeno hama sivil nawazenê, îşte na raştiye niya.

Asmera zedew ke esker çik ke destebera ci eno xo dima nêverdano. Operasyone Besta ra heta operasyonê Muratî bile na demo kilm de muskneno ma ke esker haştiye nê, dismenayîne wazeno. Heta key îndî haştiye, haştiye vame. Esker çîqa qiweta xo esta eno Kurdistan ser, ma boyna haştiye vame. Vane kutik ke di rey pê mordemî guret rawa hîreyîne gerek e çûye xo hazir kerê. Mesela ceng û haştiye çî niya wa. İndî vejîyo werte ke dewlete haştiye nêwazena. Name kirmanciyê kot ke esto, ze kutike lukî perena ci. Komelanê heqa mordemiye ra bizê, heta partiyane siyasî yo, kam ke ze dewlete ceng nêwazeno perûne sero zulum kena.

Dema ke dewlete çikra ke fam kena, gerek e ebê yî cab cideriyo ke dime xo, xo perno, qine ser ranîšo. İşte o sire hem millet hesarê xo beno, hem jî haştiye ra dayîna bemê nîjdî.


# Kêz Hatûn

Yew beno yew çinêbeno.  
Yew kêzike bena. Rojê werze-  
na xo xemelîna kuna serê ra-  
yan û dirbana ke xo rê yew mêr-  
de bivîno û mare bikero. Şina, şî-  
na leqê yew citêrî bena. Citêr va-  
no:

Kêz-kêzikê  
Kêz xatûnê  
Ling şimikê  
Reg rengînê  
Ti sera şina?  
Kêz Xatûnê vana:  
- Ez xo rê mêrde geyrena.  
Citêr vano:  
- Min rindêrî! Bê min mare  
bike.  
Kêz Xatûn vana:  
- Citêr, gama ti min ro dê,  
ti go bi çi min ro dê?  
Citêr vano:  
- Ezo bi misasiya to ro dî.  
Kêz Xatûn vana:  
- Nê. Ez to nêgena.  
Hewna kona reyan,  
şina û şina.  
Leqê yew şiwani bena.

Şiwane, Kêz Xatûn ra  
pers keno:

- Kêz kêzikê  
Kêz Xatûnê  
Ling şimikê  
Reng rengînê,  
Tiya sera şina?  
Kêz Xatûn vana:  
- Eza xo rê mêrde  
geyrena.  
Şiwane vano:  
- Min rindêrî! Bê min  
more bike.  
Kêz Xatûn vana:  
- Şiwane, gama ti  
min ro dê, ti go bi çi  
min ro dê?  
Şiwane vano:  
- Ezo bi çiweya xo to ro dî.  
Kêz Xatûn vana:  
- Nê. Ez to jî nêgena.  
Hewna kona reyan şina û şina.  
Peynî de leqê yew merî yena.  
Mer Kêz Xatûn ra pers keno:  
Kêz kêzikê  
Kêz Xatûnê  
Ling şimikê



Reng rengînê,  
Tiya sera şina?  
Kêz Xatûn vana:  
- Ez xo rê mêrde geyrena.  
Mer vano:  
Min rindêrî! Bê min mare  
bike.  
Kêz Xatûn vana:  
- Mero, gama ti min ro dê,  
ti go bi çi mir ro dê?  
Mer vano:

- Ezo bi boçê xo ya, to ro dî.  
Kêz Xatûn anêna (ewnena)  
poçê merî nermo, teklifê (vate-  
nê) merî qebûl kena û xo rê merî  
more kena.

Veywê xo kenê û benê veyw û  
zama.

Yekta H. Lezgîn

\*Min ena estanike fekê day (marda) xo ra  
goştêrî kerd û nûsnê. Eza rûpela "Yarîgeh" ra  
kena diyarî.

## Mamîk

Piço piço penîro  
Çûme mala Xelîlo  
Ew Xelîlê bi çavekî  
Berda min bi gopalekî  
Ser xatirê nanekî  
\*\*\*  
Yek û yek  
Teyrikê belek  
Zaza bilbil  
Dermanê dil  
Ne ji maciya

Gur kete ser her du çiya  
\*\*\*  
Lûwê, lûwê  
Pale guwê  
Dimse kuwê  
Ha ver da, na verda  
Tir eşte, fis eşte  
Cotêk piyanzî peyra eşte  
Da serê zincê kamî ro?  
Da serê zincê...ro.

## Tiştonek Helbest


Kanîka qinê qinê  
Mîr û hakim  
dest didinê. (Bêvil/poz)  
\*  
Hanîkê manîkê  
Fersê derê kanîkê  
Rê nade heywanekê (Qeşa)  
\*  
Qesreke spî ye  
Girover û bêderî ye (Hek)  
\*  
Şikefteke tarî ye  
Tijî pezê mirarî ye (Dev)  
\*  
Ez bi ku ve diçim  
Yek li duv (pey)  
min tê (Siya min)  
\*  
Tenûra xûmxûmî  
Tijî nanê genimî.  
(Kiwara mêşên hingiv.)  
\*  
Şîrînok e, darînok e  
Belbelok e. (Tîr)

Berhevkar: Hiseynê îzarî

### Bihar Hat

Mizgin ji we re hevalinê!  
Va ve dîsa bihar hat  
li dest û çiya gul vebûn  
lîndar ji xwe serî cobûn  
Xuşxûş dîherîke yem,  
roj dibişire baxem,  
bizin bi karîka xwe ya dîsa  
xweş tê awaza bilbilê.  
Dar bi kûlûk xemilên,  
ax, av, hewa kemilên,  
roj dîrêbûn, gemilên,  
avê xwe berda kantyan  
Rabîr zarokno bibezin!  
veşartok, bireg bilîzin,  
fîrtîrokên bar bi çîman  
ve rê bilîzin  
ji welatê xwe pê her ûn

Berhevkir: Bawî



# “Dîroka Çapemeniya Kurdî-Tekzîp”

## ‘Nûçe, bi berikan tîn tekzîpkirin’

Napolyon, li ser hêz û karîgeriya rojnayemayan gotiye: “Rojnameyek, min ji deh alayan zêdetir ditirsîne.” Ev gotin, gelekî li serpêhatiya çapemeniya Kurdistanê dikevin. Lewre çapemeniya kurd, bi taybetî di vê serdema dawîn de, tirseke xedar xist dilê dijberên xwe. Ji ber vê hindê çapemeniya kurd, di cihanê de bû, çapemeniya ku herî zêde şehîd dane. Nivîsandina dîroka çapemeniyêke bi vî rengî jî cihê şanazî ye. Her wiha bo neteweyêke ku di nav karûbarên pêwîstirîn de cih digire. Amadekirina pirtûkê li ser vî mijarê, ji ber ku sedemîn salvegera weşandina Rojnameya Kurdistanê bû, bêhtir hêja û watedar bû.

Rojnameger-nivîskar Müslüm Yücel, di pirtûka xwe ya bi navê “Dîroka Çapemeniya Kurdî-Tekzîp” de, ji rojnameya Kurdistanê heya rojnameya Demokrasiyê, li dîroka çapemeniya kurdî kolandiye. Ji bilî vî yekê, beşeke pirtûkê jî li ser şehîdên çapemeniya Kurdistanê hatiye amadekirin. Pirtûka ku ji aliyê dîtbarî ve baş hatiye sazîkirin, Weşanxaneyê Aramê belav kiriye. Lê kêmasiyên tîprêziyê (dizgi) di pirtûkê de berbiçav in.

Müslüm Yücel, di pêşka pirtûkê de

bi şeweyekî di ser re li ser kurtedîroka çapemeniyê û çapemeniya kurdî rawestiyaye. Di vî beşê de nivîskar, rola zimên şirove kiriye û cihekî gelekî girîng daye zimên. Lê di vî beşê de jî mijar awarê bûye. Ev yek ne berbiçav be jî, di beşên pirtûkê yên din de jî xwe dide der. Bo nimûne Yücel qala kemilîna pêvajoya mirovahiyê kiriye. Her wiha wî, gava qala Celadet Bedîrxan û Memduh Selîm Beg kiriye, kurtedanasîna romanên Mehmed Uzun “Siya Evîne” û “Bîra Qederê” kiriye.

Bi pey agahiyên Yücel, ji ber ku mijara dîroka çapemeniyê giran û aloz e, wî navê pirtûkê ‘Tekzîp’ daniye. Di vî warî de ev nîrxandina Müslüm Yücel balkêş e: “Rojnameyên ku nûçeyên wan bi berikan tîn tekzîpkirin”


Müslüm Yücel ji ber ku, bi xwe jî destpêkê (Yeni Ülke) heya dawiyê (Ülkede Gündem) di nav çapemeniya kurdî de xebitiye, pirtûkê serketî aniyê pê. Pirtûk, bi taybetî ji aliyê hestiyarî ve baş hatiye honandin. Ji ber vî hindê, pirtûkê xwe jî madtirşiya pirtûkên dîroki şuştîye û ev yek dike ku dilê xwendevan bêhtir bibije pirtûkê. Pirtûk carîna dibe pexşaneke hestiyarî. Ev yek bêhtir di beşa li ser rojnamegerên şehîd

de berbiçav e.

### Welat mîladek e

Nîrxandina Müslüm Yücel a derbarê rojnameya Kurdistanê jî balkêş e. Ji ber ku di nîrxandinên li ser rojnameya Kurdistanê de îdealîze kirineke subjektîf heye. Gelek ronakbîr û weşanên kurd wekî pêxember û peyaman li Miqdet Bedîrxan û Kurdistanê dinêrin. Lê Yücel balkişandiyê ser aliyên neyinî yên M. Bedîrxan û bi piştgiriya dîtinên Celîlê Celîl, helwesta wî ya li hemberî ermenî û îsawîyan (xiristiyan) wekî tiştekî neyinî bi nav kiriye.

Rojnameger Müslüm Yücel di beşa li ser Welat, Welatê Me û Azadiya We-




lat giranî daye ser helwesta dadgehên tirk û parêznameyên kurdî yên berpîrsiyarên rojnameyên navborî. Yücel derketina Welat wekî mîlad bi nav kiriye.

MAZLUM DOĞAN

## Bav û Law

HASAN KAYA



Tîp û komên artêşa nerindiye, mîna gêrik û kuliyan girtiye ser çiyayên welatê me yên dilzîz. Jixwe li nik hemû artêşên nîjadperest bûye kevneşop, dema ku bihar bi hemû xeml û xweşikahiya xwe ve hate welatekî, divê ku biharê wergerînine dojehê. Bihar hişê wan ji serên wan dibe. Bi çol û çiyân dikevin. Bedewî û delaliya kulîlkan, zelaliya avê, çiyayên sûrperî, heywanetên bêguneh, mişk û mar, dar û devî, pêlîstokên zarokan, dergûşên pitikan, qelûnên bapîran, tizbiyên dapîran, desmalên dergîstiyên di binê lingê hespên siwariyên dagirkeran de tîne pelçiqandin. Li siruştê tîne xezabê. Lê hemû lawir û hemû tiştên di fezayê de şahid in, xezaba siruştê diwartir e. Ji ya hemû artêşan a herî xedar e.

Di nav vî tepûrepa hanê de, çîzewîza çend bavan guhê mirov diqulqulîne. Dengê jê ya cerdevanekî ye. Cerdevanekî lalîk û belengaz e. Dibêje: “Min got teq û

ew kuşt. Min li patîkê serê wî da.” Yê rojnameger jê dipirse: “Ku niha careke din were tu yê dîsa wî bikujî.” Bersiv erênî ye. “Belê ku were ez avê lê venaxwim! Ez ê vî carê li eniya wî bixim.” Mirov incex evqas dikare were bêhişkirin, evqas jî nîrx û normên mirovahiyê were dûr xistin.

Patîkê serê lawê xwe yê ku gerîla ye firandiye. Heta sibehê jî nobet pê dane girtin. Heta sibehê li ber cendekê kurê xwe nobe girtiye. Sibehê nihêriye ku lawê xwe kuştîye. Dewletê nişanek jî pê ve kiriye. Rojnamegerê tirk jê dipirse: “Ku niha lawê te sax bibe û careke din were ber gund, tu yê dîsa wî bikujî?” Yê cerdevan mîna heywanekî kovî, kef bi devê wî dikeve û dibêje, ‘Erê’. Xwedayo! Ma ez çî bêjim. Ez ê vî rewşê li gorî kîjan felsefeyê, li gorî kîjan psîkolojî, sosyolojî û nîzanim çî lojiyê şirove û rave bikim.

Ez bawer im, ev mijar dikeve nav kesatiya kurdan a bindest.

Dengê din ê parlamenterekî ye. Hem parlementer, hem jî Cigirê Serokê DTP’ê (Demokratik Türkiye Partisi) ye. Hem jî serokcaş e. Mustafa Zeydan, ji bo kurê xwe yê ku mihendis bû û paşê ketibû nav refên gerîla, ji bo Yücel Zeyda wiha gotiye: “Ez bi kuştina kurê xwe pir dilşa me. Ez qet li ber neketim. Gelek mirovan gerîlatiya lawê min ji min re dikirin şermî. Lê vaye Şemo îtiraf kir ku, lawê min Yücel

hatiye kuştin. Ez bi kuştina wî pir kêfxweş im. Çi karê wî li nav PKK’ê hebû. Wî kuştin heq kiribû.”

Mustafa Zeydan bi kuştina kurê xwe, êdî xwe azad dibîne. Êdî ew bi hêsanî dikare bertil û kurtêlan bixwe. Ev çî kesatiyeke ku hatiye hermanî kirin e. Mirov dikare bibêje ku, ev her du bav ji qewmê lût in.

Lewre qewmê lût hatibû lanetkirin. Û xwedayan xezaba xwe li wan barandibû. Êdî li welatê me, law ji xwe re li bavekî layiq digerin. Her kes li yê mîna xwe digere. Serokcaşekî din ê ku ew jî parlementer e, Edip Sedat Bucak di dadgehê de gotiye “Min hemû neçeyiyên DEP’îyan ji Serokomar Süleyman Demirel re gotin. Min giliya wan li Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê (DGM) jî kir. Lê bi tenê xwestineke min hebû ji Demirel; Min got, divê ku li rastê, li ber dîwaran nemînim û dewlet li piştê min be. Demirel ji min re got, ez hem apê te me, hem jî bavê te me. Tu qet meraq neke.”

Em dibînin ku bav û kur pir li hev kirine û ji bo ku kurdan qir bikin, çî ji destên wan hatibe, kirine. Bavitî û kuritiya serokcaş û serokomar pîroz be. Ez bawer dikim ku, ev bav dê di dojeha dilê wan lawên dilpak de, bêne peritandin. Wê demê encex ew dikarin bêne şuştin û pak bibin.

# Baca Osmaniyan

**D**ewleta osmaniyan ji aliye abori ve dikeve tengasiyeke xedar, nizane edi we ci bike. Tu bacen (wergî) ku neavetine ser gel nemane. Giregiren dewlete, bang li hemu aqil-mend u aborizanen xwe dikin u dibêjin:

- Ka em de karibin ci bikin?
- Di civine de aborizaneke dibêje:
- Ez tistekî dizanim. Padişah dibêje: "De zû bibêje!" Yê aborizan dibêje:
- Sê heb bacen ku em biavêjin ser gel hene; Yek jê yên ku mirîşkên wan hebin, yê duduyan jî yên ji jina xwe ditirsin, yê sisiyan jî yên ku serê wan rût (gurî) be. Yên ku wiha bin, em ê bacê ji wan bistînin.
- Padişah vê ramanê pir diecibîne u memûren xwe li nava welêt belav dike. Memûr gund bi gund digerin.
- Li gundekî diherin malekê, dinihêrin ku mirîşkên wê malê hene. Bang li malxwê dikin u dibêjin:
- Weleh mirîşkên te hene, divê tu bacê bidî. Yê gundî dibêje:
- Eman hawar! Ma ev çi ye? Ma ev baca hanê ji ku derket? Weleh wê jina min bixeyide.
- Memûr yekcar lê vedigerînin:
- Aha weleh! Te baca duduyan jî bi-



dî, lewre tu jî jina xwe jî ditirsî. Dema wiha dibêje, gundî pir hêrs dibe u êrîşî ser memûran dike. Di vê qereqerê de, destê memûrekî li serê wî dikeve u porçeya (perûk) wî tê xwarê. Memûrek, dibîne ku mêrik gurî ye, diqîre:

- Va ye baca sisiyan jî derket, va ye baca sisiyan jî derkeecet!

ÇIYA MAZÎ

## Tiştêk ji dinê nayê

**C**îranê wî, nihêrî ku Sofî Remo heriyê çêdike u di destekî wî de teşî, di yê din de tizbiya sed u yek libî, li piştê wî meşka dêw u hey li ser heriyê dide lotikan. Bi awayekî matmayî jê dipirse:

- Sofî ma ew çi herî ye, tu çi dikî?
- Weleh tiştêk ji dinya derewîn neyê, hê ev heriya li vê derê ye, min got em ê pê tenûrekê çêbikin.
- Lê ev çi teşî ye?
- Weleh min got, hê destê min vala ye, ez hinekî vî risî jî birêsim, tu zanî tiştêk ji dinyayê nayê.
- Lê ew meşk li piştê te çi ye?
- Weleh tiştêk ji dinyayê nayê, tu zanî hele jixwe ez didime lotikan, min got bila dewê me jî çêbibe.
- Lê ew çi tizbî ye?
- Weleh min got, ev destê min î rastê, carina vala dimîne, divê ez hinekî selewatan jî bikişînim.
- Ma qey tiştêk ji dinya derewîn tê?
- Ma ez çi bikim birayo! Weleh dinya derew e haa!


### BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (119) XAÇEPIRSA

...	C	S	S	L	M
S	E	R	Ü	D	B
L	O	D	S	E	B
W	A	N	T	O	R
D	A	N	B	E	Ş
Y	E	K	I	N	E
T	G	A	R	A	N
H	A	Q	A	N	I
L	O	R	Ü	Z	
G	İ	P	H	A	D

#### Bersiva Xaçepirsa 117'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin u bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 119'an pirtûka Necdet Buldan 'Yasaklı Topraklar' e.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin u tevî navnîşana xwe jî me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata hejmara 117'an Koma Rewşen 'Çiyayê Bêzar' qezenc kirine: Ömer Bular/Amed, Tarık Arslan/Wan, Nihat Kiper/Semsûr, Kemal Medeni/ Stenbol, Zozan Kaya/Amed

...bin, reşbîn	Ling	Karekî xirab	Kirde	Dawera oksijenê	Salyar
Sirgûnkirî	Dino... (Wêne)	Kanê	Durist	Dawera azotê	
					Tipek kurdî
					Tipek
Kurtenvîs a bîjîşk	Eş û ...			Alavekî por	
Dawera hidrojenê	Dawa			Gelek Anadolîyê	
Berepaşki dacekek		Sala mirov			Tîpa dawîn
Hiroj, emro		tê de			Baneşane k
Tûjik		Tipek			
Wezneke helbest			Zexeli		
ristinê			Endam		
		Berepaşki sewelak		Bi soranî 'pir'	
		Neteweyek		Beşekî ji ling	
Din		Zimanê karê veşarî			
Gihaneke k		Rêxistinek			
				Dawera Argonê	
				Agir	
Welatek				Qeretefak tewangê	
Qeymax				Tipek	
		Ekonomî			



**WELAT**

ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

■ Li ser navê  
Gündem Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti. (adına)  
Kwedi (Sahibi)

SELAHATTIN DELI

■ Yönetim Yeri  
Çakırağa Mah. Sorguççu  
Sk. No:11/6  
Tel: (0212) 530 01 40

■ Büroya İrtibatê  
(İrtibat Bürosu)  
Aydın Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu/İSTANBUL  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

■ Berpirsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

■ BELAVKIRIN  
BIRYAY Dağırtım

■ NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilcilerimiz)

München:  
(Nâmetî Çişi yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815

■ Brüksel:  
Medeni Ferbo  
32 532 721 12 03

■ Swisre:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07

■ Bonn:  
Ahmet Baraçlıç  
49 228 66 17 40

■ Hollanda:  
S. A. Fewzi  
31 104 85 55 43

■ Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yüsiw

*Hacetê şerê taybet û lîminî:*

# Zûrnamey û zûrdanî

Rojname û televîzyonê tirkan pên vaten de fina peyniyê PKK ard. Taybetî jî nê operasyonê peynî peyra heveyan vat: "Pakîno peyin, çimê şarê tirk roşnî bê!" Heveyan jî vat: "Qediyay, çend hebî mendî, iyê jî nê operasyonê Muratî ya biqediyê." Nînan, artêşa xo ya hend paya kerd ke kesê ke enê nezdî ra nêsilasnayê vatê qayê, iye rast vanê. Nê vatenan ser ra, di heftey hîrê nêravêrdî, zûrê nînan vejîyay werte. Xora zûrana serkewtinî nêbenê û cayê jî nêvîniyayê. Ek bibo jî, tenya serkewitinê sexte û pûç benê.

Ze ke yeno zanayin, wesar û amnan jû kişt ra koyanê Kurdistanî xemilneno û kiştê bîn ra jî hewnanê artêş û serdaranê dewleta tirk remneno. Çimki wexto ke wesar û amnan yeno hem eyam beno germ, hem şer beno gur û germ. Artêşa Tirk jî her ser manganê wesar û amnanî de, mabenê germî û gurîna şerî de gerîlayan ra derbeyan sero derbey wena û mecbûr manêna, giranî dana şerê psikolojîk.

Winakerdina wazena şerê psikolojîkiya kulkê şarê kurd û gerîlayan teng kiro. Coka kar û barê xo viradena, vîst hîris generaliya, çewres pancas hezar leşkeriya operasyonî (vardayinî) virazena. Raya rojname û televîzyonana jî zaf zaf propogandaya nê operasyonanê kena. Vaten ke ca de bo, her roj serkewtinê pûç û sextey vejena werte. Artêş û serdarê dewleta tirk nê wextan de, hend zûrê girdî çekenê ke, ê xo jî

Xora serdarê rojname û televîzyonê tirk pêro pawenê ke artêş ci ra teva vajo û ê jî biyarê ca. Rojnameger û nûstox Ragıp Duran coka qandê nînan vano "Medyawa bi Apolet"



baweriya nê zûran û vatenan nêkenê. La belê ancî jî, enê vatenan û zûran qandê şerê psikolojîk û qandê şarî zûran, serkewtinanê pûçan û sextena xapeynayin anê zîwan. Wazenê enê zûran û serkewtinanê pûçana emrê xo heveyan derg kirê û serê gerîlayan ra darbey werdin racenê.

Operasyonê ke, nika 24 generalan û nezdiyê çewres hezar eskeriya virast jî, çöşmeyê enê kerdinan de virasto. Çim-

ki wesar ame û iyê zey wesaranê verînan her roj gerîlayan ra derbeyan sero darbey wenê. Coka qandê serê, enê derbeyan werdin û zûranê xo racenayin, ci rê serkewtinê pûç û saxtey lazim ê. Raya serkewtinanê pûç û sexteyan jî, şerê psikolojîk ra ravêrena.

Artêşa tirka xo jî, ena ray rind zana, coka senî ke kewna tengî, hema veyindena serdaranê televîzyon û rojnameyan û fermanê şerê psikolojîk dana.

Xora serdarê rojname û televîzyonê tirk pêro pawenê ke artêş ci ra teva vajo û ê jî biyarê ca. Rojnameger û nûstox Ragıp Duran coka qandê nînan vano: "Medyawa bi Apolet" Yanê kes şeno rastîna, nînan wina jî biyaro zîwan; rojnameyan rê vajo zûrdanî (qutiye zûran) û nînan piya jî, hacetê kayê artêşa tirk. Çimki eke hacetê kayê artêşa tirk nêbê, wezîfeya xo biyarê ca, hendayê zûrî nêçekenê û xeberê ke xo jî bawerî nêkenê, rîperan û ekrananê xo ra nêdanê. Eki wina bikirê nêbenê hacetê kayê artêşa tirk, benê rojnamey û televîzyonî. Qe nêvanê, ma enê fikir û vînayinî par jî, pêrar jî, rîperan û ekrananê xo de ardî zîwan. Nê fikir û vînayinî rast nêvejiyay, peyniyê PKK niyamê û goreyê seranê verînan PKK hem hetê amor û hem jî hetê heremana (cayana) bî vêşî. Verê di seran hîrê, jew koyanê Kurdistanî de gerîlay estîbî, la belê ewro hem amorê gerîlayan koyanê Kurdistanî de, bî vêşî û hem jî gerîlayan emser di serriyo xo resna koyanê Türkiye û iyê her roj vera miyanê Türkiye yenê?. Nêvanê, çimki nêşenê. Her ser zûran û serkewtinanê pûç û sexteyanê artêşa, wendoxan û şarê xo xapeynenê. Hetanî çimhal?. Bêguman hetanî wendox û şarastîn bivînê û aqilyê xo. Her çiqas ê rojê, rojê ewroyin de niyaysenê jî, ê rojê bêrê û êkê ewro zûrana wendoxan û şarê xo xapeynenê iyê o çax, xo rê ca bigeyrê, eki bivînê?..

ÛLKEDE

# Ji Gündemê

## Manşetên qedexekirî

Rêlibergirtinên li ser Ûlkede Gündemê dom dikin.



3 gulan 1998 yekşem:

### HÛRSÂ DAYIKAN LI DJÎ MGK'Ê

Beşek ji ifadeyên ku dibêjin ên Şemdin Sakî in "Dayikên Şemiyê di bin qontrola PKK'ê de ne" bûn. Li dijî vê yekê, dayikan reaksiyoneke tûj nîşan da. Dayikan diyar kirin ku, MGK ji çalakiyên wan aciz dibe û ji bo ku rê li ber wan bigire ketiye nava tevgerê. Her wiha Dayikên Şemiyê ev pirs ji wan kir, ku ji bo çi ev derdor ji windabûna bi sedan mirovan aciz nabî.

### TIRKIYE YEK JI 80 WELATÊN KIRÊT E

Der heqê salvegera Roja Çapemeniya Azad 3' yê gulanê de, Komaleya Rojnamevanên Sînomenas (RSF) raporek weşand. Di raporê de hate ragihandin ku, ji 185 welatên endamê NY'ê li 79'an rewşa çapemeniya azad baş e, ya 80'yî kirêt e, ya 26'an jî pir kirêt e. Di raporê de Tirkiye jî di nav 80 welatên ku rewşa Çapemeniya Azad nebaş e de cih girt.

Li gorî raporê jî l'ê rêbendana 1998'an vir de li Tirkîyeyê ligel İsmail Beşikçi 91 rojnameger di girtîgehan de ne. Her wiha di raporê de hate diyarkirin di 1997'an de herî hindik 255 rojnameger hatine binçavkirin; ji van, 18 kes jî 48 saetan bêhtir di binçav de hatine girtin û 62 rojnameger jî bûne hedefa êrişan.

4 gulan 1998 duşem:

### DI 'HEREKETA MEZIN' DE ÎNTIXAR

Rûyê kirêt ê 'hereketa mezin' ku demeke dirêj e li pesara Amed, Çewlik û Mûşê berdeham dike, derkete holê. Di vê herekete de ji aliyê rayedarên ve hatibû daxuyandî ku 39 hezar û 500 leşker beşdar bûne. Lê durûtiya wan derkete holê, leşkerêkî bi navê Sefer nexwest ku bi leşkeran re beşdarî şer bibe, întixar kir. Cenazeyê Sefer anîn Amedê.

TSK di serî de dixwest giraniyê bide hereketa bejî lê li dijî êrişên gerilayan encama ku dixwest wernegirt û di rojên dawîn de giraniya xwe da êrişên hewayî. Firokên şer F-16 û F-4'an duh û îroj bi sibehî pesara Qulp û Dara Hênêyê bombebaran kir. Şerê di navbera gerila û yekîneyên leşkeran de berdeham dike. Cenazeyên 6 leşkerên ku duh hatibûn kuştin, anîn Nexweşxaneyê Leşkerî ya Amedê. Li heman herêmê jî aliyê gerilayan ve êrişa roketavêjî li dijî konvoya leşkerî pêk hat. Hate ragihandin ku di encama vê êrişê de du wasita bêkêr bûne.

6 gulan 1998 çarşem:


### SÎNYALA ÊRÎŞAN HATE DAYÎN

Ûlkücüyên faşîst ji biryarên darêzgerî (yargî) û polîsan hêzê distînin. Piştî ku li Boluyê xwendekarê zanîngehê Kenan Mak, bi destê wan hate qetilkirin, şeva din dîsa li ser kar bûn. Kesê bi navê Bilal Vural (20) piştî ku ji cihê kar derket, li gel du hevalên xwe di ber avahiya Ûlkücü Ocağı ku girtî ye re derbas bûn û li vir bûn hedefa êrişên tîfingan. Bilal Vural, di vê êrişê de jiyana xwe ji dest da. Endamê HADEP'ê Halil Atik jî ji mil û

biriye û ji qereqolê dûr ketiye.

### LEHIYA HÛRSÊ MEZIN DIBE

Li ser kuştina xwendekar Kenan Mak, ku ji aliyê Ûlkücüyan ve hatibû kuştin, rêxistina Navendî ya HADEP'ê û yê Sakarya, Stenbol, Eskişehir, Bursa û Enqere, nûnerên Enqereyê yê Komeleya Tunceliyan û Tûm-Bel Senê çûn Boluyê. Heyetê li ber avahiya Navendî ya HADEP'ê daxuyaniyê da çapemeniyê û li gel xwendekar û nêzikên xwendekarên, ku bûbûn hedefa êrişan, qerenfil danîn cihê ku Mak lê hate qetilkirin.



Di encama êrişên Ûlkücüyên faşîst de xwendekar Kenan Mak û welatparêzê kurd Bilal Vural hatin kuştin.

lingê xwe derbeyên xedar xwarin û hate emeliyatkirin. Ew heta niha di bin tedawiya hûrbînî de ye. Her wiha rewşa wî xedar e. Piştî bûyerê êrişkar hatin binçavkirin. Di lêgerînê de li ser wan tîfing, demançeyêke çardexur û du jop û du kêr hatin ditin.

Piştî lêkolîna polîsan hate diyarkirin ku, tîfinga ku di êrişê de hatiye bikaranîn a nûnerê Ocaxa Ûlkücüyan ya Taxa Sannayîyê Nefiz Başaran e. Nefiz Başaran jî piştî bûyerê serî li qereqola taxê çaye û îdia kiriye ku tîfinga ku di bûyerê de hatiye bikaranîn, berî vê bi demêkê kin jê hatiye dizîn.

Her wiha li gorî agahiyan, Başaranê, ku polis wekî 'reis' xitabî wî dikin, tîfinga ku li ser kesên binçavkirî hatiye girtin

Li Mersînê jî ji bo protestokirina êrişan, xwepêşandan hatin lidarxistin û gelek saziyan bi daxuyaniyên çapemeniyê êriş şermazar kirin. Êrişa Ûlkücüyan di civîna CHP'ê ya rêveberiyê de jî hate rojvê.

Parlamentêrê CHP'ê yê Enqereyê Yılmaz Ateş xwest ku der heqê Wezîrê Karên Hundirîn Murat Başesgioğlu de pirsiyarname (gensoru) bê dayin. Parlamentêrê Stenbolê Algan Havaloglu jî xwest ku lêkolîna meclîsê bê kirin.

Parlamentêrê MHP'ê İsmail Köse piştigiriya Ocaxên Ûlkücüyan, ku bûne navendên êrişan, kir. Köse îdia kir ku, Ocaxên Ûlkücüyan 'hêlinên perwerdehiyê' ne û got eleqeya wan bi MHP'ê tune ye.

Her wiha Köse bûyera l'ê gulanê ji wiha nirxand: "Ew bûyera navborî, ku militanek bûye sedemê wê, tenê pêjinkariya komek xortên me ku nikarin rê li ber hisên xwe yê neteweyî bigirin e."

7 gulan 1998 pêşem:

### POLÎSAN RÊ LI BER XWEPÊŞANDANA GIRT

HADep'yan xwastin ji bo cenazeyê Bilal Vural merasimê çêbikin lê polîsan rê neda wan. Bilal Vural li Kağthane yê di encama êrişê faşîstan de hatibû kuştin. Polîsan zor dan malbata Vural, ku cenazeyê wî bibin Mazrayê (Elezîz). Dîsa wan rayedar û avukatên HADEP'ê jî bi 'Hûn dixwazin bûyeran derxin' tehdît kirin. Gel cenazeyê Vural, bi diruşmê û tililiyan şand Mazrayê.

Li aliyê din 17 Ûlkücüyên ku Kenan Mak dabûn ber kêran û kuştibûn ligel 4 mexdûran duh dexistin DGM'ya Enqereyê. Hate ragihandin DGM'ê 16 ji wan serbest berdane û kesê ku sûc hilgirtiye ser xwe girtine. Serokê Belediyeya Keçiörenê yê MHP'yî Turgut Altok bi hatina DGM'ê bal kişand sûcên û avukatê Ûlkücüyan Can Özbay jî îdia kir ku, dosya şandine Boluyê.

Di vê navberê de li dijî kuştina Kenan Mak û Bilal Vural ku ji aliyê Ûlkücüyên ve hatin kuştin, reaksiyonan duh jî berdeham kirin. Buroya çapemeniyê ya HADEP'ê diyar kir ku, ji êrişan hikûmet berpirs e. Serokê Baroyê Stenbolê Yücel Sayman daxuyand ku di sedema pîrbûna êrişan de bandora veşartina Ûlkücüyan heye. Her wiha di xwepêşandanên xwendekarên zanîngehan de jî hate ragihandin ku, wê êriş bêbersiv nemînin.

### Rêxistina ERNK'ê ya Ewropayê:

### MAFÊ MEŞRÛ YÊ XWEPARASTINÊ BI KAR BÎNIN

Rêxistina ERNK'ê ya Ewropayê piştî kuştina Kenan Mak û Bilal Vural der heqê êrişên Ûlkücüyên de daxuyand. Di daxuyaniyê de bal kişand ser vê yekê ku, li metropolên Tirkîyeyê êrişên li dijî kurdan, xwendekaran û rayedarên HADEP'ê gurtir bûne.

Rêxistina ERNK'ê ya Ewropayê jî ragihandin ku, ev bûyer perçeyek ji êrişên dewletê ne û diyar kir wê hesabê êrişan bistînin. ERNK'ê bang li gelê kurd kir ku mafê xwe yê meşrû bi kar bîne.